

**Araştırma Makalesi • Research Article****Tîpolojîya Dem û Cihî ya Çîrokên Gelêrî yên Kurdî******Kürtçe Masalların Zaman ve Mekân Tipolojisi******Time and Space Typology of Kurdish Folk Tales***

Kenan Subaşı**

Kurte: Çîrokên gelêrî û vegêran du çemkên pir peywendîdar ên edebî ne. Berî ku çîroka modern ji aliyê vegêranê ve bê xurtkirin û bi gelek pêlên weku modernîzm û postmodernîzmê ve bê dewlemendkirin, çîroka klasîk yan jî gelêrî bi piranî li ser binyadeke vegêranî ya sade dihat ristîn. Ev sadebûn weku stûnên sereke yên vegêranê ne ku her dem di nav deqeke honandî de xuyane. Ev çar stûn weku vegêr/çîrokbêj, karakter, rûdan, dem û cih dikarin bîn binavkirin. Me di vê xebatê de çîrokên gelêrî yên Kurdî ji aliyê stûna çarem a vegêranê ve nixand. Di encamê de em gihîştin tîpolojîyeke dem û cihî ya çîrokên gelêrî yên Kurdî. Dema rûdanê bi piranî muelleq, bêsînor, nekîşkirî ye. Cihên vekirî hatiye tercihkirin ku aksiyon tê da pêk tê, dekorên berfireh, giştî û şêlû dekorên di çîrokên gelêrî da ne. Cihên fantastîk jî aşînatîya mirovan ya cihan têk dibe ku ev jî dergehê macerayê vedike. Me weku rêbaz di hîlbijartina çîrokan de senifandina Aarne-Thompson bîngê danî û ji aliyê xurtbûna vegêranê ve di nav çîrokên çapkîrî yên Kurdî de piştî xwendineke giştî 18 çîrok hîlbijartin. Di lêhûrbûna dem û cihî ya çîrokan de jî me xîsûsen xebata Gerard Genette, Seymour Chatman û Marie-Laure Ryan bîngê girt.

Bêjeyên Sereke: Çîrokên Gelêrî, Vegêran, Dem, Cih.

Öz: Masal ve anlatı birbirlerinden pek de ayırt edilemeyecek iki edebi terimdirler. Günümüzdeki öykü türü, anlatı açısından daha girift bir hale getirilmeyip modernizm ve postmodernizm dönemlerinden geçirilmeden önce masal olarak anılıp çoğunlukla sade bir anlatı yapısıyla örülürdü. Fakat bu sadelik aslında anlatının temel sütunlarını barındırır ki kurgusal metinlerde bu sütunlar olmazsa olmazlardandır. Bu sütunları anlatıcı, karakter, olay, zaman ve mekân şeklinde adlandırmak mümkündür. Bu anlatı esasına dayanarak biz de bu çalışmada Kürtçe masallarını anlatının dördüncü sütunu olarak belirttiğimiz zaman ve mekân olguları açısından değerlendirdik. Öykü zamanı çoğunlukla muğlak, sınırı belirlenmemiştir. Masal anlatılarında çoğunlukla açık mekânlar tercih edilirler. Dekorlar çok geniş, genel ve belirsizdirler. Fantastik mekânlar insanlardaki gerçek mekân algısını kırdığından okura ya dinleyiciye macera kapısını aralamış olur. Sonuç olarak Kürtçe masalların belirli bir zaman ve mekân tipolojisini ortaya çıkardık. Üzerinde çalıştığımız masalların seçiminde yöntem olarak Aarne-Thompson'un sınıflandırmasını esas alarak derlenip yayınlanmış Kürtçe masallar arasında anlatısal olarak zengin 18 masal seçtik. Bununla beraber

* Ev gotar ji teza doktorayê ya bi sernavê “Kürtçe (Kurmanci) Masalların Anlatı Tipolojisi/Tîpolojîya Vegêrana Çîrvanokên Kurdî-Kurmanci” hatiye derxistin ku tez bi şewirmendiya Doç. Dr. Hayreddin Kızıllî Zanîngeha Dicleyê di Makezanista Çand û Zimanê Kurdî da hatiye amadekirin.

** Doç. Dr., Mardin Artuklu Üniversitesi, Türkiye’de Yaşayan Diller Enstitüsü, Kürt Dili ve Kültürü Anabilim Dalı
ORCID: 0000-0001-7744-1646 kenansubasi@artuklu.edu.tr

Cite as/ Atıf: Subaşı, K. (2024). Tîpolojîya dem û cihî ya çîrokên gelêrî yên Kurdî. *Anemon Muş Alparslan Üniversitesi Sosyal Bilimler Dergisi*, 12(2), 411-432 <http://dx.doi.org/10.18506/anemon.1415302>

Received/Geliş: 05 January/Ocak 2024

Accepted/Kabul: 20 August/Ağustos 2024

Published/Yayın: 30 August/Ağustos 2024

bu masalların zaman ve mekân analizinde de Gerard Genette, Seymour Chatman û Marie-Laure Ryan'ın çalışmalarını esas aldık.

Anahtar Kelimeler: Masal, Anlatı, Zaman, Mekân.

Abstract: Folk tale and narrative are two literary terms that can hardly be distinguished from each other. Before today's story genre was made more intricate in terms of narrative and passed through the periods of modernism and postmodernism, it was referred to as a folk tale and was mostly woven with a simple narrative structure. But this simplicity actually contains the basic pillars of narrative, which are indispensable in fictional texts. It is possible to name these pillars as narrator, character, event, time and space. Based on this narrative principle, in this study, we have evaluated Kurdish folk tales in terms of time and space, which we have mentioned as the fourth pillar of narrative. As a result, we have revealed a certain time and space typology of Kurdish folk tales. Story time is often vague and undefined. In fairy tale narratives, open spaces are mostly preferred. The decors are very large, general and uncertain. Since fantastic places break the perception of real space in people, they open the door of adventure to the reader or listener. We selected 18 narratively rich folk tales among the Kurdish folk tales compiled and published based on Aarne-Thompson's classification. In addition, in the analysis of time and space of these folk tales, we took the works of Gerard Genette, Seymour Chatman and Marie-Laure Ryan as a basis.

Keywords: Folk Tales, Narrative, Time, Space.

Destpêk

Li ser peywendîya çîrok û vegêranê gotineke giştî ya vegêrannasan heye ku dibêjin her çîrokek/serpêhatîyek, vegêranek e û mirov ji roja ku li ser rûyê dinê bi mirovên din re peywendî danîye û heya niha teşneyê vegêrana serpêhatîyên xwe bûye (Derwişcemaloğlu, 2016: 46; Jahn, 2015: 48). Dîsa di vê babetê de Roland Barthes di pênaseya vegêranê de balê dikişîne ser du xalan ku ya yekem; vegêran di esasê xwe de ji dîroka mirovahîyê û pê ve di her civakê de hebûye. Li gorî wî li tu derê û di tu wextî de civakeke ku bê vegêran jîyabe, tune. Xala duyem jî wisa nîşan dike ku di cihanê de şewazên bêsinor ên vegêranê hene ku ev yek ji ber pîrbûna cureyan pêk tê. Çimkî ji cureyên devkî bigirin heta cureyên nivîskî, ji dîmenên kînetîk bigirin heta yên statîk, hemû jest û cureyên têkel vegêranekê dihewînin ku çîrokên gelêrî jî yek ji van cureyan e (vgz. Jahn, 2015: 48). Îcar çîrokên gelêrî yên Kurdî jî di nav vê çand û adetê vegêranê de teşe girtiye. Loma çîrokên gelêrî digel peyama û naverokên xwe di serî de li ser binyadeke vegêranî ava bûne ku ev jî hebûna vegêr/çîrokbêj, karakter, zîncîreya rûdanê, dem û cih e. Xebata Vladimir Propp a navdar (1928) a bi navê *Morfologia Skazki* (Morfolojîya Çîrokên Gelêrî) xisûsen li ser zîncîreya rûdanê ya çîrokên derasayî rawestayê. Herwiha qala dabeşbûna karakteran a di nav heft qadan de jî di vê xebatê de heye. Lêbelê Propp ji aliyê diyardeyên dem û cihî ve tu tîpolojîyekê pêşkêşî me nekiriye. Herçiqas nêrînên giştî yên derbarê mewhûmên dem û cihî yên di çîrokên gelêrî de hatibin vegotin jî xisûsen di kurdî de bi awayekî kûr ev mijar nebûye babeta nixandîne. Loma me xwest di vê xebatê de em xisûsen li ser tîpolojîya dem û cihî ya çîrokên gelêrî yên Kurdî rawestî û bibînin ka bi çî binyadî teşe girtine.

Berî ku em derbasî analîza dem û cihî ya çîrokên gelêrî yên Kurdî bibin, herweha behsa rêbaz û sînorên xebatê bikin, divê em behsa xebatine sereke yên li ser çîrokên Kurdî bikin. Em xebatên ku hatine kirin dikarin bi giştî dabeşî du qismên bikin. Yek jê xebatên berhevkarî û tomakarîya çîrokên gelêrî yên Kurdî ne. Ya din jî xebatên analîtîk û nixandînen binyadî yên li ser çîrokan in.

Ji aliyê berhevkarîyê ve ji bilî çend nimûneyên di kovara *Rojî Kurd* û *Jînê* de meriv dikare bibêje ku xebatên Kurdên Sovyetê, xebatên kovarên bi navê *Hawar*, *Ronahî* û *Roja Nû* xebatên ewil in. Bêguman ev îdia ji bo berhevkarîya di zaravayê Kurmancî da ye. Helbet piştî van xebatan xisûsen li her çar parçeyên Kurdistanê bi salên 1990î û pê ve xebatine berhevkarîyê pêk hatine. Lê di nav xebatan bi giştî berhevkarîya Heciyê Cindî, Emînê Evdal, Ordîxanê Celîl û Celîlê Celîl xebatên herî tekûz in ji hêla rê û rêbazên berhevkarîya keresteyên folklorê ve. Ji bilî van kesayetên navborî heke em çend navên sereke jî bidin bêguman berhevkarîya Celadet Bedirxan, Mehmet Emin Bozarslan, Stig Wikander, Feqî Huseyn Sağnıç, Mehmet Öncü, Hilmi Akyol, Zinarê Xamo, Xalid Sadinî, Riza Çolpan, Selahadîn Mihotulî, Abbas Alkan, Nihat Öner, İkrâm İşler, Fettah Tîmar, Mesût Fîdan, Yasemin Elban, Necat Keskin, Mehpus Serhedî, Mem Mukriyanî û hwd. nimûneyên li ber çavan in di zaravayê Kurmancî de.

Dema meriv li xebatên analîtîk û binyadî raçav dike cara ewil meriv xebatên di kovara *Jînê* de xisûsen yên Kemal Fewzî dibîne ku peywendîya mîtos û çîrokên gelêrî xebitîye. Dîsa ji aliyê senifandina vî cureyî ve meriv xebatên Kurdên Sovyetê dibîne. Herweha li Başûrê Kurdistanê jî Îzeddîn Mistefa Resûl û Şikriye Îbrahîm Resûl di warê senifandina vî cureyî de ked dane û li gorî Vladimir Propp xebatin li ser çîrokên gelêrî yên Kurdî kirine. Dîsa bi weşandina kovara *Asoyî Folklor* gelek xebatên senifandin û nixandina çîrokan li gorî motîf îndeksa Stith Thompson û morfolojîya çîrokan a Vladimir Propp hatine kirin. Li Bakur jî di serê salên 2000î de xebatine analîtîk ên weku *Zarok û Çîrok* ya Remezan Pertev hatine kirin ku bi teorîya psikanalîst çîrok nixandine. Xisûsen piştî vebûna akademîya Kurdî li Bakur, bi dehan gotar û tez li ser senifandin, motîf, berawirdkirin û binyada çîrokên gelêrî yên Kurdî li gorî nêrînên Anti Aarne, Stith Thompson, Vladimir Propp, Hans-Jörg Uther hatine kirin. Me jî li ser tîpolojîya vegêrana çîrokên gelêrî yên Kurdî tezeke doktorayê amade kir ku stûna vegêranê ya “dem û cih” di teza me da beşa çarem bû û me di vê xebatê de weku gotar pêşkêş kiriye. Li gorî xebatên berî me hatine kirin me jî di vî warî de valahiyek peyda kir û me xwest ku em çîrokên gelêrî li gorî binyada vegêranê binirxînin. Di vê gotarê de em ê bi tenê xisûsiyetên dem û cih binirxînin û destnîşan bikin.

Diyardeyên dem û cihî di nixandineke vegêranî de bi piranî digel hev tîn nîqaşkirin. Ev her du dîyarde di eslê xwe de du mewhûmên peywendîdar ango hevtamamker hatine destnîşankirin (Prince, 2011: 51-52). Herweha tu vegêranekê ne bê dem ne jî bê cih mimkûn e bê ristin û neqîlkin. Li gorî vê esasê me di vê xebatê de mewhûmên dem û cihî yên çîrokên gelêrî vekola û di encamê de ghiştin tîpolojîyêke dem û cihî ya berbiçav a çîrokên gelêrî yên Kurdî. Encamên ku derketin holê hem ji bo nivîskarên edebîyata modern û xisûsen jî ji bo nivîskarên edebîyata zarokan muhîm in. Çimkî tê zanîn ku çîrok bi qasî tema û naveroka xwe ji aliyê xisûsiyetên vegêrana xwe ve jî balkêş in ku mirov di guhdarîkirin û xwendina wan da aciz nabe û her gav weku hewcedarîyê dibîne.

Di peywenda dem û cihî ya çîrokên gelêrî de me ewil dabeşkarîya dema rûdanê û dema gotarê yan jî cihê rûdanê û cihê gotarê kir da ku em di encamên xwe û sazkirina tîpolojîyê da nexelitin. Digel vê di kategorîya demê de em li ser dema gramatîk a çîrokên gelêrî ango kêşana lêkerên kurdî ya li gorî deman rawestiyayin. Di kategorîya cihî de digel jihevqetandina her du cihan me amaje bi şayesandina cihî di çîrokên gelêrî de kir.

Di vê xebatê de du rêbaz hatine hilbijartin yek ji wan rêbaza destnîşankirina çîrokan e û ya din jî analîza van çîrokan li gorî vegêrannasiyê ye û helbet her du stûnên vegêrannasiyê yên bi navê dem û cih. Me ji bo vê xebatê bi giştî ji 28 pirtûkên berhevkerî û tomarkerî yên çîrokên gelêrî yên Kurdî (Kurmançî) nêzî 1300 çîrok bi nêrîneke analîtîk a vegêranê xwendin û me ji van çîrokan nêzî 230 çîrok neqandin ku ji hêla vegêranê ve serkeftî ne. Di nav van çîrokan de varyantên cuda hebûn ku me bi piranî varyanta herî serkeftî hilbijart. Ji nav van çîrokan jî bo nixandina dem û cihî li ser bingeha senifandina Anti Aarne-Stith Thompson (1951: 482-486) 18 çîrokên herî tekûz (çîrokên ajelan (4 çîrok), çîrokên eslî/derasayî (8 çîrok), pêkenok û anekdot (6 çîrok) hatin hilbijartin. Çîrokên ajelan yên bi navê “Hecî Gur”, “Kûçik û Gur”, “Kerê di Bîrê da” jî berhema Zinarê Xamo (2014: 252-254, 287-292, 401-402) û çîroka bi navê “Çûk û Kelem” jî ji berhema Fettah Timar (2017: 35-39) hatiye wergirtin. Çîrokên eslî/derasayî yên bi navê “Mîrza Mihemed û Çilkezî” û “Mîrza Mihemed û Urfût” jî berhema Nihat Öner (2016: 13-24, 57-62), çîroka bi navê “Kalikê Teyş” jî berhema Yasemîn Elban (2017: 39-47), çîrokên bi navê “Şaîsmail” û “Ahmed û Mihemed” jî berhema Heciyê Cindî (2014a: 141-177, 215-225), çîroka bi navê “Serhatîya Mîrê Ereba” jî berhema Heciyê Cindî (2014b: 145-150) çîroka bi navê “Bîrê Çûk” jî berhema Heciyê Cindî (2015a: 151-156) û çîroka bi navê “Silêman Pêxember” jî berhema Heciyê Cindî (2015b: 175-178) hatine wergirtin. Pêkenok û anekdotên bi navê “Hema”, “Derewînên Tekmanê”, “Ardû ji Me re Çi” jî berhema Xalid Sadinî (2012: 31-32, 166-167, 245-246), pêkenoka bi navê “Cemşo û Gemşo” jî berhema Mesût Fîdan (2014: 97-98), pêkenoka bi navê “Derew ji Derewan Mezintir” jî berhema Heciyê Cindî (2015b: 269-271) û pêkenoka bi navê “Rûvî û Liba Genim” jî berhema Fettah Timar (2017: 125-128) hatine wergirtin.¹ Piştî ku ev çîrok hatin destnîşankirin analîza

¹ Divê em li vir balê bikêşin li ser xala berhevkerin û tomarkerina çîrokên gelêrî yên Kurdî ku ew deqên sereke yên xebata me ne. Di nav xebatên berhevkarîya zargotina Kurdî (Kurmançî) de xisûsen yên ku bûne çavkanîya vê

me ya binyadî ya dem û cihî ya çîrokên gelêrî hatiye kirin. Ev analîz li gorî nêrînên vegêrannasên weku Gerard Genette, Seymour Chatman û Marie-Laure Ryan hatiye kirin.

1. Cudahîya Navbera Dema Rûdanê û Dema Gotarê

Her vegêranek ji bo ku pêk bê muhtacê demê ye. Bêyî demê ne rûdanek pêk tê ne jî ew rûdan tê vegêran. Lewma di her vegêranekê de du cure dem hene ku yek ji wan dema rûdanê (story time)² ye. Yanî ew bûyera ku rûdide di nav kronolojîyê de demê de rû dide. Ya din dema gotarê (discourse time) ye. Yanî bi alîkarîya ziman di vegêranekê de ji bo ku ew rûdan li mûxatebekî bê neqilkirin, hewcedarî bi demê heye. Çawa ku vê yekê teorîsyenên Alman weku dema çîrokê (erzählte Zeit) û dema vegêranê (Erzählzeit) dabeş kirîye (vgz. Genette, 2011: 21) wisa formalîstên Ūris jî weku dema fabûlayê û dema sûtjetê dabeş kirîye (vgz. Xidir, 2012: 195; Kulamshaeva, 2008: 92, 104). Ji bo ku nirxandineke tekûz a dema vegêranekê bê kirin, ev dabeşkirin lazim e. Çimkî di dema rûdanê de dem bi awayekî kronolojîk rêz dibe. Dibe ku ev rûdan di kêliyê de pêk hatibe û dibe ku di salek, pêncî sal an deh hezar salan de pêk hatibe. Lê dema ev rûdan bê neqilkirin, gelek caran ev kronolojî têk diçe û anakronî, akronî û cudahîya ritmê dest pê dikin. Yanî di pêşkêşkirina vegêranê de bi rêz (order) û maweya (duration) dema rûdanê tê listin. Ev yek ji ber derfeta vegêranê çêdibe. Çimkî mimkûn e rûdana ku di kêliyê de pêk hatibe, di kêliyê de jî bê vegêran. Lê rûdana ku di deh salan de pêk hatibe, heke yek bi yek çî bûbe, bê vegêran dê ne kaxiz têrê bikin ne jî derfeta mûxataban rê bide vê yekê. Lewma dema rûdanê ya ku jê re dema asayî yan jî rasteqîn tê gotin bi awayekî pêlîstî, vediguhere dema gotarê ku jê re dema neasayî yan jî nerasteqîn tê gotin (Genette, 2011: 22-23; Çıraklı, 2015: 37).

Dema em bala xwe bidin çîrokên gelêrî, em ê di wan de jî cudahîya her du deman bibînin. Lêbelê berî ku em qala dema gotarê ya çîrokên gelêrî bikin û têkçûna dema rûdanê ya di çîrokên gelêrî de berçav bikin, em ê bi kurtî bala xwe bidin dema rûdanê ya çîrokan. Di çîrokên gelêrî de dema rûdanê bi piranî muelleq e. Demeke bêsinor û nekifşkirî ye. Her gav bi qalibên demên neteqez dema rûdanê tê destnîşankirin di çîrokan de. Bo nimûne li gorî çîrokên ku me berçavkirî bi piranî dema rûdanê bi van qaliban tê sazîkirin: “Di dem û dewranekê de...”, “Rojekê...”, “Carek hebû ji caran...”, “Wextekî”, “Êvarekê”, “Berî niha bi çend salan...”, “Dibêjin berê...”, “Serê Sibehê”, “Wê salê...”, “Rojeke payîzê”, “Havînê” û hwd. Vê şewazê hem astengiyek xistîye pêşîya xwîner an guhdar ku li gorî demê nikaribe tesbîtan bike, hem jî rê li pêşîya nemirî û berdewamiya çîrokên gelêrî vekirîye. Çimkî ev çîrok bi van qaliban kengê bê xwestin, dikare bê vegêran û qalibên destnîşankirî ji bo her dem û dewranê guncaw in. Li gorî me di berdewamî û windanebûna çîrokên gelêrî de ev şewaz tesîreke xwe ya mezin hebûye. Çimkî ev qalib bi tu cih û karakterî re ne peywendîdar in û weku demên azad ji bo her cihî û karakterî guncaw in. Herwiha bi awayekî hêsan pêkanîna xebatên parodîk ên li ser çîrokên gelêrî dîsa xwe dispêrê vê taybetiyê. Helbet ji bilî van qaliban tesbîteke me ya din jî ew e ku bi taybetî di hin pêkenok û anekdotan de demeke diyarkirî ya rûdanê xuya nake. Tenê rûdan di nav dema gotarê de tê neqilkirin ku ev jî weku taybetiyê vegêranên pêkenokî dikare bê hesibandin. Bo nimûne pêkenoka “Derew ji Derewan Mezintir” wiha dest pê dike: “Sê meriv rabûn çûne seyrangê, xwe ra qasekê bigerin. Lê tejkê wan hebû, ew jî wan ra çû. Navê yekî Çîlo, yê din Şîlo, yê sisya Kulo.” (Cindî, 2015b: 269) Lê di vir de bersiva “kengê ev rûdan qewimî?” tune. Belkî herî zêde bi alîkarîya dema gramatîk dema rûdanê bê sepanandin. An jî di pêkenoka “Hema” de dîsa dema rûdanê nehatiye destnîşankirin: “Mirovekî Goyî hêstira xwe bar dike û dikeve rê, barê wî tirîyê gelîyê Goyan e û dikeve rêya hevraz ber bi zozanê tê.” (Pêkenok, 31) Bi rastî pir hêsan e ku tenê di serê van pêkenokan de ji qalibên me yên ku me li jor destnîşankirî, yekî daynin. Lêbelê ev yek nehatiye kirin û bivênevê vê pîrsê tîne hişê me: “Gelo ji ber ku di eslê xwe de ev bûyer ne rasteqîn in an jî bi mubalaxe ne, dibe ku dema wan jî hîn zêdetir muelleq hatiye hiştin?” Çimkî heke demeke diyar a rûdanê hebe, wê çaxê dê bi demeke asayî re peywendîya wê hebe û helbet dê nebe malê hevpar jî. Yanî mimkûn e ku ew çîrok ji şewaza anonîmbûnê derkeve, heke dema rûdanê demeke şênber û asayî be.

xebatê herî tekûz xebata Heciyê Cindî ye ku meriv pê derdixe ku midaxaleyê rasterast li çîrokan nekiriye. Xebatên din meriv pê nîzane. Ji ber ku bi rê û rêbazên berhevkarîya keresteyên folklorê nehatine pêkanîn. Loma divê em vê xalê li ber çavan bigirin.

² Ev binavkirin ji aliyê Seymour Chatman (bnr. 2009: 57) ve hatiye danîn. Me jî binavkirina wî esas girt.

Piştî van her du tesbîten dema rûdanê ya çîrokên gelêrî, em ê niha jî li ser dema vegêranê rawestin ku di eslê xwe de digel nirxandina dema gotarê, cudahîya wê ji dema rûdanê baştir kifş dibe. Bi vê mebestê Genette (2011: 23) di dema gotarê de weku rêz/tertîb (order), mawe/rîtm (duration) û frekans/dubare (frequency) sê kategorî destnîşan kirine. Herwiha Chatman (2009: 57) jî tîne ziman ku peywendîya di navbera van her du deman de gelek pirsîyarên teorîk derdixîne holê ku li gorî wî di analîza van deman de kategorîyên Genette dê bibe bingeş ji bo xebatên di vî warî de. Lewma em ê yek bi yek li ser wan kategorîyan rawestin û di çîrokên gelêrî yên Kurdî de ev peywendî bi çî şiklî çêbûye, destnîşan bikin.

1.1. Rêz

Li gorî Genette (2011: 28-29) rêza dema gotarê, bi du awayan çêdibe. Yek ji wan bi awayekî kronolojîk ku dema rûdanê û dema gotarê bi heman rêzê rêz dibin. Ya din jî bi awayekî anakronîk (têkbirina kronolojîyê) e ku dema gotarê di dema rûdanê de bi paşdevegeran (flashback/analepsis) û pêşdebirinê (flashforward/prolepsis) hin teserûfan dike û rêza asayî tîk dibe bi şertê ku zîncîreya rûdanê hilneveşe (Chatman, 2009: 58-59). Yanî ev mudaxale di rastîya demê, kronolojîyê û rûdanê de çênabe û tenê di dema gotarê de xuya dibe. Heke bi awayekî kronolojîk rêz bibe şemayeke wiha derdikeve holê:

Dema gotarê	A	B	C	D	E	...
Dema rûdanê	1	2	3	4	5	...

$A1 > B2 > C3 > D4 > E5 > \dots$

Lê heke bi awayekî anakronîk bê rêzkirinê dê şemayeke wiha derkeve holê û rûdana ku di serî de diqewime dê paşê bê vegêran:

Dema gotarê	B	C	D	A	E	...
Dema rûdanê	1	2	3	4	5	...

$A4 > B1 > C2 > D3 > E5 > \dots$

Ji ber ku di çîrokên gelêrî de dem îzafî, muelleq û ne zelal e, ew bi piranî bi awayekî kronolojîk rêz dibin. Herwiha nebûna dema nivîskaran a di vegêranên devkî de dibe egerek ku dema rûdanê zêdetir kronolojîk rêz bibin. Lêbelê kêm be jî em carinan dibînin ku di nav çîrokan de pasajên weku anakronî xuya dibin. Vê yekê Lîxaçev wiha destnîşan dike: “Mirov di deqên folklorîk de tenê bi rêya ‘kehanet’ û ‘niqûtîna dil û pêjn’ê pêşdebirinê dikare pêk bîne. Paşdevegeran jî bi rêya bîranînê û bibîranînan çêdibe. Dema ku nivîskar nebe, zehmet e ku mirov ji xaleke sabît li dema rûdanê binêre ango di folklorê de derfetek tuneke ku bi rêya nivîskarekî meriv bikare perspektîfeke demê destnîşan bike.” (vgz. Kulamshaeva, 2008: 111) Li gorî vê nêrînê anakronîyên ku di çîrokên gelêrî de çêdibin li ser esasê dema rûdanê û dema gotarê çênabin. Bi rêya çîrokbêjanê tê pêkanîn ku xwe dispêrin texmîn, xeyal, kehanet, bîranînê û hwd. û anakronî saz dikin. Yanî ji ber ku dema rûdanê ne zelal e, destnîşankirina dema anakronîyê jî dê heman şiklî ne zelal be û lewma bi rêya teknîkên ku Lîxaçev jî dîyar kirine, anakronî dê encax wisa bikarin pêk bînin di çîrokên gelêrî de.

Weku me li jor jî dîyar kir, anakronî bi giştî weku paşdevegeran û pêşdebirinê pêk tê. Lê Genette van her du cureyan li gorî hin xisûsiyetan dabeşî çend qîsman dike. Berî wê qala dûrbûn (distance) û berdewamiya (amplitude) anakronîyan dike û dibêje dûrbûn mesafeya anakronîyê ya ji dema vegêranê nîşan dide (2011: 37-38). Dibe ku anakronî saetek berê dema vegêranê yan jî piştî wê be, dibe ku bi salan jê dûr be. Berdewamî jî maweya anakronîyê nîşan dide. Dibe ku pir kurt di anakronîyê de qala kêliyêkê bê kirinê û dibe ku dirêj qala salan bê kirinê. Îcar Genette (2011: 39) pêşî anakronîyan³ li ser du beşan weku anakronîya derekî û anakronîya navekî parve dike û paşê anakronîya navekî weku anakronîya navekî ya heterodîgetîk û anakronîya navekî ya homodîgetîk dike du qîsim ku anakronîya

³ Li vir qesda me ji anakronîyê her du cure ne. Yanî hem paşdevegeran hem jî pêşdebirin.

navekî ya homodiegetik jî bi awayekî du şaxî weku anakronîya tamamker (completive) û anakronîya dubarekirî (repetitive) lê zêde dike (2011: 40-55).

Em ê niha cureyên van anakronîyan rave bikin û herwiha di çîrokên gelêrî de bi çî şiklî hatine bikaranîn destnîşan bikin. Em ê pêşî qala paşdevegeranê bikin ku ew di vegêranê de û di çîrokên gelêrî de li gorî pêşdebirinê zêdetir tê bikaranîn.

1. Paşdevegerana derekî (heterodiegetic flashback/analepsis): Destpêk û dawîya vê anakronîyê jî dema vegêranê pêşdetir e û maweya vê anakronîyê ne di nav maweya vegêrana esasî de ye. Di çîrokên gelêrî de ev cure bi piranî bi rêya bîranînan û herwiha di çîrokên çarçovekirî de xuya dibe. An jî di nav çîroka esasî de heke qala rabirdûya karakterekî bê kirin, ev anakronî tê bikaranîn. Bo nimûne di çîroka “Serhatîya Mîrê Ereba” de dema ku sê lawik dixwazin derkevin rêwîtiyekê Mîrê Ereban ji wan re qala rêwîtiya xwe ango bîranînen xwe wiha dike: “Mîr got: Ez ê herekê we risqekî bidime we, meçin, hûn gunê ne. Gotin: Nave, gerekê em herin. Mîr got: **Lawkno, rojekê ez û sê hevala va, mîna we, em rabûn çûne Keleşî. Em çûne perrê be’rê ketine gemî, gemî rê ket....**” (Cindî, 2014b: 145) Di vir de ji ber ku hem dema vegêrana esasî hem jî dema vegêrana zeliqandî ne zelal e, çîrokbêj xwe dispêre teknîka bîranîne û dema rêwîtiya Mîrê Ereban vedigerîne berî rêwîtiya sê lawkan û helbet ji bo ku Mîrê Ereban bixwe serpêhatîyê vedigêre dawîya rêwîtiya wî jî berî destpêka rêwîtiya lawikan diqede. An jî di çîroka “Dîtinhezâr”ê de dema ku qala navê Dîtinhezârê tê kirin dîsa bi paşdevegeraneke derekî meseleya navê Dîtinhezârê tê vegêran ku destpêk û dawîya wê meseleyê berî dema çîroka niha ye ango ji vegêrana esasî hatîye veqetandin. Jixwe dema mirov baş bala xwe bidê, dê bibîne ku dema gramatik jî guherîye û bûye dema borî ya dûr:

...Carna ku digel her du xuşkên xwe û hin qerwaşên koşkê derdiket diçû gerê, eger hin kes rastê wan bihatina û ew bidîtina, didîtin. Yan na, wisa bi awayekî taybetî xwe û rindîya xwe nîşanê mirovan nedida. **Rojek ji rojan, xortekî pîrr pîrr dewlemend ê ji welatekî cîran, salixê rindîya wê bihîstibû û ji bo dîtina wê rabûbû bi rê ketibû hatibû serbajarê wan....** (Bozarslan, 2000: 92)

Dîsa di pêkenoka “Derewînên Tekmanê” de hîlbijartina derewçînên baş tê kirin û dema ku vegêr heqê gotinê dide Xalê Elî, ew jî kêlîka ku tê de ye, bi paş de vedigere û serpêhatîya xwe wiha dibêje: “Îro ez derketim Textê Leyla, min li wê derê karîkek wisa mezin dît ku pênc bir pez lê mexel hatîye lê hê jî alîyekî karîkê vala maye.” (Sadinî, 2012: 166) Dîsa di vê paşdevegeranê de destpêk û dawî berî dema vegêranê ye. Ji ber ku weku bîranînek mudaxilê vegêrana giştî dibe. Ji ber ku çîroka esasî li ser derewan hatîye avakirin, li vir tenê fonksiyona vê paşdevegeranê ew e ku çîroka esasî bê dagirtin. Lewma li gorî Genette (2011: 40) paşdevegerana derekî ji ber ku derekî ye, kêlîkek be jî mudaxaleyê vegêrana yekem ango esasî nake û çimkî tekane fonksiyona wê vegêrana rabirdûyê û tamamkirina vegêrana ewil e. Di her sê mînakên me de tekane armanca paşdevegeranan, yan vegêrana serpêhatîyan e yan jî ravekirineke meseleyeke rabirdûyê ye. Di çîrokên gelêrî de herî zêde ev xuya dibe.

2. Paşdevegerana navekî (homodiegetic flashback/analepsis): Destpêk û dawîya vê anakronîyê di nav dema vegêranê de ye. Genette dibêje ji ber ku dema vê anakronîyê di nav maweya dema vegêrana esasî de ye, dibe ku tevlihevîya deman çêbibe. Lê di çîrokên gelêrî de ji ber ku ev bi piranî bi rêya bîranînan çêdibe, ev ihtîmala tevlihevîyê jî ji holê radibe. Ev anakronî li gorî Genette dibe du qisim ku ya yekem anakronîya navekî ya heterodiegetik e. Ev anakronî di nav dema vegêrana esasî de pêk tê. Lêbelê anakronî qala meseleyeke ji bilî vegêrana esasî dike ku Genette (2011: 40) dibêje bi piranî dema ku em di nav vegêrana esasî de rastî karakterekî nû tên û vegêr bixwaze qala rabirdûya wê bike, ev anakronî tê bikaranîn. Her çiqas pir kêr nimûneyên vê di çîrokên gelêrî de hebin jî di çîroka “Mîrza Mihemed û Çilkezî” de dema ku vegêr dixwaze Meîna Çil Cenî û Sikûkê bide nasîn, vê anakronîyê bi kar tîne û ji devê Sikûkê wiha dibêje:

Mîrza Mihemed **çi zû bîra te çû?** Ne min li Şengalê ji te re **gotibû** ez qîza meîna çil cenî me. Meîna çil cenî dîya min e, sî û neh cenîyên wê niha li cem in, ya çilan jî ez im. **Min rojekê hêrsa dîya xwe hanî, dîya min nifir li min kir û got, ‘Sikûk tu bibî kerekî û li devê behrê bî.’ Ez jî bi nifira dîya xwe va bûme ker û ketime devê behrê. Tu jî hatî, te ez li devê behrê dîtîm û te ez ji xwe ra hanîm.** (Öner, 2016: 19)

Anakronîya duyem a navekî jî anakronîya navekî ya homodîegetîk e ku ev jî bi du awayan pêk tê ku yek jê anakronîya tamamker e. Bi piranî berî anakronîyê qevaztinek (ellipsis) çêdibe û anakronî şûna wê qevaztîne dadigire. Bo nimûne di çîroka “Kûçik û Gur” de dema ku Kûçik destûrê ji gur digire û diçe du hefteyan li ser hev nayê, qevaztin bi vî şiklî tê vegêran: “Gur hefteyekê, du hefteyan pa lê kûçik nehat.” Bi vî şiklî du hefte tê qevaztin. Îcar dema ku bi rêya anakronîyê qala van du hefteyan tê kirin ji devê gur wiha tê vegêran: “Ev du hefte ne ku di nava daristanê de ez li benda te kevizikî bûme.” Gur ji dema vegêranê ya niha vedigere destpêka du hefteyan û çawa ev her du hefte derbas kirine, bi awayekî kurtkirî vedigêre. Awayê duyem ê anakronîya navekî ya homodîegetîk jî anakronîya dubarekirî ye ku di vî anakronîyê de li ser heman xeta vegêrana esasî tiştê ku berê hatibe vegêran bi piranî ji bo bê bîranîn ev anakronî tê bikaranîn. Bo nimûne di çîroka “Şaîsmail” de tiştên ku berê di navbera Şaîsmail û Xwişka heft xortan de qewimîye (r. 155) careke din bi devê qîzikê ji bo birayên wê tê vegêran:

- Forqê, go, em seva te ketine şêr, rûyê te da birakî me hate kuştinê, te jî vira derî vekirîye, meriv anîye cem xwe?

Xûşka wîya zarî bû jê ra got, go:

- Bira, go, xortekî delal hate ber dêrî, gelekî kire qareqar, min derî lê venekir, rîkinê kelê xist hilşand hat hundur, cem min. Gelek zimana min ra xever da, min cava wî neda, axirîê bi saz min ra got, go: ‘Kula te çî ye, go, min ra bêje belkî ez derdê te derman bikim.’ Go, min gotîye, wekî heft birê min hene, çûne şêr, go, gotîye ‘rîya birê xwe nîşanî min de, ez ê herim’, min rîya we nîşan daê da, lê daye çûye. (Cindî, 2014a: 157)

3. Pêşdebirin (flashforward/prolepsis): Di vegêranekê de berî ku kronolojîya dema rûdanê xwe bigihîne rûdaneke paşê, bi awayekî anakronîk teknîka pêşdebirinê dikeve dewrê û ew rûdan berêtir tê vegêran. Çawa ku Genette (2011: 60) anîye ziman li gorî teknîka paşdevegeranê ev teknîk kêmtir tê bikaranîn. Herwiha ev teknîk jî weku paşdevegeranê ji hev dabeş dibe ku jixwe me li jor dema ku qala vî dabeşbûnê kir, me bi zanefî navê giştî weku anakronî bi kar anî. Îcar di çîrokên gelêrî de çawa ku Lîxaçev gotibû pêşdebirin bi piranî weku kehanet û niqûtîna dilî derdikeve holê, em dikarin çend şewazên din jî lê bar bikin ku di çîrokên Kurdî de xuya dibin. Ev weku plankirin, agahdarkirin, şertgirtin, xeyal, monolog û dîyalogan jî xuya dibin ku bi devê karakteran tînan ziman. Bo nimûne di çîroka “Mîrza Mihemed û Çilkezî” de Sikûk bi pêşdebirina navekî wiha plana çûyîne ji Mîrza Mihemed re dibêje:

Mîrza Mihemed, emê niha herine devê behrê. Lê pêşîya wê, tu here ji min ra heft çermê dewara, heft bar qîr hilde bîne. Qîrê li piştê min xe, çerman bide ser. Gava em çûne devê behrê, diya min yê min bibîne û yê gelekî hêrsa wê bê. Yê carê were, gezekî li piştê min xe û wê çermekî rake. Heta heft çerm xelas bin, hêrsa wê yê derbas be û dilê wê yê rehet be. Lê çerm nebin, wê çermê min rake û min bikuje. (Öner, 2016: 19)

An jî di çîroka “Şaîsmail” de dîsa plan bi şewazeke pêşdebirinê ji devê Derwêş wiha tê vegêran:

Go: Here go, tu vî sêvê bibî herî, sipî bikî, qalikê wê bidî mihîneke xwe, mihîna te îsal heft sale cenû neanîne, sêvê jî kerî bikî, kerîkî tu bixwî, kerîk jî jina te bixwe. Îşala elatiela xadê wê ewledekî bide te, cenûkekê jî bide mihîna te. Lê tu car- tu car nav lê nekî, hetanî ez tîm. Ez ku hatim, ez ê nav kurê te kim jî, cenîê kim jî... (Cindî, 2014a: 142)

Ev her du pêşdebirin jî çawa ku tê de plankirinek hebe herwiha bi rêya dîyalogê pêk hatine. Weku din her du jî weku pêşdebirineke navekî di nav dema gotarê de mane. Ji bilî van mînakên bi rêya xeyalan jî dîsa ev şewaz hatîye bikaranîn. Bo nimûne di pêkenoka “Cemşo û Gemşo” de, Cemşo û Gemşo li ser xeyaleke ku dê pêk neyê bi hev dikevin û xeyalên xwe tînan ziman: “Cemşo destê xwe nik gelî ve kir û ji Gemşo re got: Xwezî Xwidê teji vî gelî pez bidaya min. Gemşo jî destê xwe nik gelî ve kir û got: Xwezî Xwidê teji vî gelî gurî bidaya min jî. Cemşo got: Jû te yê çî ji guryan bikirîya? Gemşo got: Min ê ew gurî berdayan pezê te û qelana wan bianîya. Gotinek ji Gemşo gotinek ji Cemşo... Ketin nav êkdu...” (Fidan, 2014: 97-98) Ev pêşdebirin jî bo ku weku xeyalek li derveyî rûdana giştî ye weku pêşdebirineke derekî dikare bê nixandî. Ji bo pêkanîna pêşdebirinê monolog jî rêyeke din e ku di çîroka “Kûçik û Gur” de bi devê Kuçikî wiha xuya dike: “Halê min ne tu hal e, ji bo parîyek nan ez şev

roj ji xelkê re notirvanîyê dikim. **Ez dê herim li serê çîyan û li daristanê ji xwe re azad û serbixwe bijîm ji vî halî çêtir e.**” (Xamo, 2014: 252) Herwiha divê em destnîşan bikin ku pêşdebirin li gorî paşdevegeranan kurttir, sadetir in û carinan weku nîşanekê xuya dibin (Çıraklı, 2015: 39).

1.2. Mawe

Mawe ji bo zelalkirina peywendîya dema rûdanê û dema gotarê yek ji xalên giring ên demê ye. Li gorî Genette (2011: 83) pîvana maweya dema gotarê ne pêkan e. Çimkî ew li gorî dema xwendinê (guhdarîkirinê) tê pîvan ku maweya tu xwendinê ji sedî sed nayê pîvan. Herwiha nezelalîya maweya dema rûdanê jî ku li vê yekê bar bibe, rewş aloztir û giriftir dibe. Dema em çîrokên gelêrî bifikirin ev pîvan zêdetir zehmet dibe. Çimkî hem dema rûdanê pir şêlû ye û hem jî dema gotarê. Herwiha maweya îcrakirin û guhdarîkirina çîrokên gelêrî jî ne sabît e ku mirov bikare li gorî vê yekê dema rûdanê û dema gotarê berawird bike. Herçiqas Ricardou ji bo vê berawirdkirinê diyalogan mînak bide jî, Genette yeksanîya maweya diyalogan û rûdanê weku yeksanîyeke teqez napejirîne. Çimkî dîsa di gotarê ango neqilîkirinê de hin faktorên din rol digirin weku leza telafûzê. An jî di dema rasteqîn a diyalogê de rawestanên bêdeng dê çawa bî hesabkirin? Lewma Genette (2011: 84) dibêje yeksanîya ku diyalog nîşanî me didin ne teqez be jî nêzîkatîyeke herî maqûl e. Herwiha astengîyegeke din, guherandina cihî ye ku ev jî bi lezatiyê re peywendîdar e. Di tu gotarekê de ne mimkûn e ku derbasbûnên di navbera mekanan de weku maweya rasteqîn bê neqilîkirin. Genette (2011: 85) jî li ser vî mantiqê digihêje vî encamê ku li gorî wî tu vegêran nîne ku di lezatiyê de mudaxale neke û herwiha lê zêde dike û dibêje dibe ku vegêranek bêyî anakronîyan çêbibe, lêbelê bêyî cudahiya rîtmê (anisochrony) mimkûn nîne pêk bê. Bo nimûne hin çîrokên gelêrî hene ku dema wan a rûdanê mîlyon sal dikêşe. Lêbelê bêyî bikaranîna teknîkên cudahiya rîtmê mimkûn nîne ku mîlyon sal kêlî bi kêlî bê neqilîkirin an xwendin û guhdarîkirin. Îcar Genette (2011: 93) maweyê ango cudahiya rîtmê di çar sernavan de rave dike ku ev weku kurtkirin (summary), rawestandî (pause), qevaztin (ellipsis) û sehne (scene) hatîye destnîşankirin. Yanî bi rêya van her çar teknîkan dema gotarê ji dema rûdanê tê veqetandin û cudahiya rîtmê ya van her du deman derdikeve holê.

1. Kurtkirin: Di kurtkirinê de dema rûdanê li gorî dema gotarê dirêjtir e. Kurtkirin derbasbûnên di navbera sehneyan de hêsantir dike. Dema ku vegêr çend saet, roj, hefte, meh û salan bêyî ku bikeve nav hûrgulîyan di nav paragrafê an rûpelekê de vegêre, ev teknîk pêk tê. Dema ku Genette (2011: 94) vî pênaseyê dike dibêje ev teknîkeke kevnare ye. Çimkî ev teknîk herî zêde di deqên klasîk de hatine bikaranîn ku çîrokên gelêrî yek ji wan deqan e. Heta di hin çîrokan de ji bilî pasajên diyalogê hema hema çîrok bi giştî bi vî teknîkê hatîye sazîkirin. Helbet çend sedemên vî hene. Yek jê çîrokên gelêrî ji aliyê qewareya xwe ve deqên kurt in. Lê bi piranî digel ku deq hew qas kurt e jî maweya dema rûdanê gelek dirêj e. Lewma mecbûr vegêr ji bo ku di nav wê deqa kurt de rûdanê vegêre, xwe dispêre kurtkirinê. Egereke din ew e ku di çîrokên gelêrî de ji hûrgilî û şayesandinan zêdetir aksiyon giring e. Aksiyon jî bêyî kurtkirinê zehmet e ku di deqên kurt de bi hûrgilî bê neqilîkirin.

Em ê li vir yek bi yek nekarin hemû kurtkirinên çîrokên gelêrî yê ku me hîlbijartî nîşan bidin. Lê ji bo ku em bibînin ka di çîrokan de ev teknîk çawa hatîye bikaranîn, em ê çend nimûneyan jê nîşan bidin. Nimûneya yekem çîroka “Hecî Gur” e ku ev çîrok hema bibêje tenê bi rêya diyalog an teknîka sehneyê û herwiha bi kurtkirinan hatîye vegêran. Dema rûdanê bi awayekî zelal nehatîye diyarîkirin. Lê dema ku xwîner an guhdar bala xwe bide tevger û axaftinên gur dê texmîn bike ku dema rûdanê herî kêr rojekê kişandîye. Çîrokê bi giştî di pênc rûpelan de cih girtîye ku pareke vî çîrokê ya mezin diyalogên di navbera gur û mîh, gur û ker, gur û hêstirê de ye. Yê mayî jî bi temamî jî kurtkirinan pêk hatîye. Bo nimûne di serî de ji bo vegêran derbasî sehneyeke din bibe kurtkirin bi vî şiklî hatîye kirin:

Ji bo ku ji xwe re nêçîrekê bike, rabû bi çol û çepelan ket, vir de gerîya, wê de gerîya, lê tu tiştêk bi dest nexist. Dawîya dawî çû li ber gomeyekî mezin rûnişt û ji xwe re kûr û dûr fikirî... Rabû çû ji xwe re şahrikek ji derekê peyda kir û li dor serê xwe gerand û tîzbîyeke nod û neh hebî jî da destê xwe û berê xwe da deştê. Pir çû hindik çû rastê mîhekê hat. (Xamo, 2014: 287)

Di çîrokên gelêrî de bi taybetî hin qalib hene ku ji bo vî teknîkê hatine afirandin. Bo nimûne “heft roj û heft şevan def û dewat” an jî carinan “sê roj û sê şev” carinan jî “çil roj û çil şev”. Qalibekî din weku “pir çû hindik çû rastî (tiştêkî, derekê an kesekî) hat” xuya dibe. An jî weku “hal û hewalê xwe ji

serî de gotin” pêk tê. Carinan tenê bi rêya lêkeran kurtkirin pêk tên ku Chatman (2009: 62) dema qala vê teknîkê dike, ji bo vegêranên devkî dibêje ku di wan de ji bo ku kurtkirin pêk bê yan hewcedarî bi hokareke demê heye yan jî bi rêya lêkerên lebatî ev yek pêk tê. Yanî her lêkerekê lebatî dema rûdanê di gotarê de dikare kurt bike. Bo nimûne di pêkenoka “Derew ji Derewan Mezintir” de ev pir baş xuya dike: “Ewana çûne nava mêşe. Wira kêwrîşkeke razayî dîtin. Girtin, şerjêkirin, agir dadan, petin, danîne ber xwe, wekî bixun.” (Cindî, 2015b: 269)

2. Rawestandî: Di vegêranê de dema ku ev teknîk tê bikaranîn, demêke rûdanê ya ku teqabûlî dema gotarê bike, xuya nake. Çimkî dema rûdanê rawestayê û bi piranî vegêr kesan, deran an jî tiştan teswîr dike. Ev teknîk jixwe herî zêde di şayesandinan de dixuyê. Lêbelê ji ber ku çîrokên gelêrî zêdetir bi rêya aksiyonê hatine sêwirandin, em zêde rastî şayesandinan nayên. Yan di kêma çîrokan de xuya dibin an jî şayesandinên pir kurt in ku carinan herî zêde bi sê çar sifetan tên kirin. Di çîroka “Elîyê Bitenê” de vegêran radiweste û şayesandin wiha pêk tê: “Eyarê xwe di nav gulbîna de veşart û ket hundirê koşkê. **Koşkeke mezin, bîst, sî ode tê de hene. Heryek bi rengekî raxistî, balgihine etlas û qedîfe. Oda mezinê malê jî xuya ye. Tê de kulînek heye.** Elî ketê û xwe veşart.” (Bedirxan, 2009: 75-76) Herwiha dema ku di vegêranekê de nivîskar bixwaze rasterast nêrînen xwe bi xwîner re parve bike ev teknîk dîsa pêk tê. Di çîrokên gelêrî de dema ku çîrokbêj an jî vegêr rasterast peyama xwe dide, pênaseyek dike an jî ji guhdêr rasterast pirsan dike, ev teknîk xuya dibe. Di çîroka “Çerxê Felekê” de çîrokbêj kurt be jî dem rawestandîye û peyama xwe wiha daye: “Mûsa kûzî erdê dive, sê kêvira na, deh kevira dike destê wê, divê: -Min tu berdayî. **Berdana jinê wî çaxî da bûye edet.** Mûsa pêxember dajo, hinekî jê dût dikeve...” (Cindî, 2015b: 211) Dîsa di pêkenoka “Derew ji Derewan Mezintir” de vegêr rasterast ji xwîner an guhdêr pirsan dipirse û demê radiwestîne: “Hêrsa Kulo rabû, pihînek tejiyê xist. Tejiyê kire kastîn, revî. Ji tejiyê tope perçê xas ket. **Gelo tu dikarî bêjî – ew perçe wê bighîje kê?**” (Cindî, 2015b: 269) Weku din di çîrokên gelêrî de rawestandîna demê di rewşên destpêkê de û di xelaskirinê de xuya dibin. Bo nimûne di çîroka *Kalikê Teyş* de di destpêkê de ji bo ku vegêr karakter, dem û cih destnîşan bike bêyî ku dema rûdanê bide destpêkirin destpêkeke wiha dike: “Carek ji caran, xêr û xweşî bibare li ser hazir û guhdaran, bi tevî bê mal û bê yaran, ji xeynê bekoyê ewanan. Di dem û dewranekê de li welatekî mêrikekî feqîr û fiqare hebûye, sê heb jî keçên wî yên ezep hebûne. Navê keça mezin Soryaz, a navîn Sorxwîn, a biçûk jî Xunav bûye.” (Elban, 2017: 39) Axirî her çiqas nimûneyên vê di çîrokên gelêrî de xuya bibin jî diyar e ku pareke pir biçûk tê de girtîye. Ev yek hem bi kurtbûna çîrokan re peywendîdar e hem jî weku me li jor diyar kir bi aksiyon-navendbûna wan re.

3. Qevaztin: Dema ku ev teknîk di vegêranê de tê bikaranîn dema gotarê radiweste û dema rûdanê bi lez dibe. Digel kurtkirinê teknîka ku herî zêde di çîrokên gelêrî de xuya dike yek jê jî qevaztin e. Carinan di çîrokên gelêrî de demên pir dirêj û derasayî tên qevaztin weku di çîroka “Birê Çûk” de bi wî rengî qevaztinek çêdibe: “Horî divêjin Mîr Mihê mîlîona sal derbaz bûye, tu yê ku da herî?” Çimkî çîrok bixwe li ser demêke farazî û derasayî ango qala wextê bihuştê dike û lewma qevaztineke bi vî rengî xuya dibe. Genette (2011: 107-110) dema ku qala qevaztinê dike wê bi sê awayan dabeş dike. Yek jê qevaztina eşkere ye. Yanî çiqas dem hatibe qevaztin, bi hokarekê tê nîşandan weku “piştî hefteyek, deh roj di ser de derbas dibe”, “Usa roj û meh derbas dibin.”, “neh meh, neh roj, neh sihetê wan tamam bûn.” Qevaztina din, a veşartî ye. Yanî bi hokareke demê nayê dîyarkirin û xwîner an jî guhdêr di nav peywendê de û carinan bi alîkarîya lêkeran fam dikin ku qevaztin çêbûye weku “Mîrza Mihemed û Mihemed va mîna du bira bi hev ra **mezin bûn.**” (Öner, 2016: 57) An jî di çîroka “Birê Çûk” de dema ku Mîr Mihê diçe bihuştê û paşê vedigere dinyayê, ji bo ku derbasbûna demê ya bi lez bê nîşandan, vegêrê çîrokê Mîr Mihê bi hin karakterên din re dixwe nav guftûgoyê da ku derkeve holê gelek sal derbaz bûne. Ev qevaztin bi piranî di wextê xewê de jî tê bikaranîn. Bo nimûne di çîroka “Şaîsmaîl” de qevaztina di navbera êvarê û sibehê de wiha çêbûye: “Êvarekê qewazê padşê hate ber derê kalê, gotê: Kalê karê xwe bike sivê diçî şerê Erebe... Sive xêr ser we da bê, ser wan da jî hat.” (Cindî, 2014a: 175) an jî wiha: “Êvarê ew û kurê wezîr va ketine cî razan. Sivê wexta rabûnê, kurê wezîr rabû lê nihêrî...” (r. 148) Di çîrokên gelêrî de herî zêde ev her du cure qevaztin xuya dibin. Qevaztina sêyem a ku Genette (2011: 110) qal dike di çîrokên gelêrî de peyda nabe ku ew bixwe jî dibêje tesbîtkirina vê qevaztinê gelek zehmet e ku jê re gotîye qevaztina farazî.

4. Sehne: Di vegêranê de bi vê teknîkê dema rûdanê û dema gotarê herî zêde nêzî hev dibin û heta yeksanîyeke nisbî jî di navbera her du deman de çêdibe. Vegêranên devkî û nivîskî ev teknîk jî drama û şanoyê wergirtîye. Çimkî ev teknîk li ser nimayîşkirinê ava bûye. Yanî di rûdanê de çi pêk bê wisa jî tê nîşandan. Ev teknîk herî baş di dîyalogan de xuya dibe ku di çîrokên gelêrî de em dikarin teqrîbî bibêjin ku ji sê paran du parên gotarê bi dîyalogan dagirtî ye. Di vê teknîkê de şayesandin û anakronî mînimîalize dibin. Lê dîsa pir kêmbê jî em dibînin ku bi rêya dîyalogan hin anakronî pêk tên di çîrokên gelêrî de. Chatman (2009: 66) jî bilî dîyalogan dibêje ku di hin tevgerên kurt de jî em rastî vê teknîkê tên. Lêbelê di çîrokên gelêrî de ev yek zêde xuya nake. Di nav çîrokên me de mînakeke bi vî rengî di çîroka *Kalîkê Tevş* de xuya dibe: “Xunav gotina wî wekî henek fam dike û dikene. Gava ew dikene, kalo her du diranên wê yên zêr dibîne û wê nas dike.” (Elban, 2017: 45) Heke dîyalog bêyî mudaxaleya vegêr rasterast bê dayîn nêzîkahî baştir çêdibe. Bo nimûne em ê du awayên dîyalogan li vir nîşan bidin. Yek jê vegêr mudaxele nake û dîyalog rasterast çêdibe:

Şêx dike û nake Qesabê Comerd ji biryara xwe venagere; jê re dibêje:

-Amadehîya xwe bike, sibe ezê te bişînim.

-Mala te ava, ez ji te pir memnûn im...

-Ku tu neçûya çêtir bû; sebra me bi hev dihat...

-Na! Wilo çêtir e... Teqdira Îlahî wisa bûye. (Omerî, 2013: 68)

Di awayê din de vegêr bi “got”, “dibêje”, “gotîye” dîyalogan dide destpêkirin ku di çîrokên gelêrî de bi pîranî bi vî rengî ne. Ev yek di dema xwendinê de kêmbê jî rîtmê jî dîyaloga asayî hêdîtir dike:

Mîrza Mihemed ça ku av kire devê xwe dîsa ev ji devê xwe havît, got:

-Pîrê ev aveka ça ye, şor û germ e?

Pîrê got:

-Kurê min qisûra min nenêre, min mîza xwe da te. Çimkî ava me tuneye.

Mîrza Mihemed got:

-Çima ava we tuneye?

Pîrê got:

-Kanîyeke me heye. Dêw berê avê guherandîye, nahêle kanî were. Em herin wê derê wê me bikuje. (Öner, 2016: 61)

1.3. Frekans/Dubare

Di peywendîya dema rûdanê û dema gotarê de dîyarkerek jî frekans e. Frekansa vegêranê li gorî dubarebûna rûdanê û dubarebûna gotarê derdikeve holê. Genette (2011: 115) dibêje rûdanek dibe ku bi pêkhatineke yekcarî nemîne û çend caran dubare pêk bê. Ji bo vê yekê hilatina rojê mînak dide û dibêje her çiqas di her hilatinê de dibe ku cudahî hebin jî axirî tiştê ku pêk tê: roj hiltê. Yanî li gorî wî di vir de tiştê muhîm ew e ku wekhevîyek di navbera wan de heye. Herwiha di vegêranê de rûdan dema ku dubare bin an jî bi dubareyî bî vegêran, mîmkûn e ku cudahîyên perspektîf, şêwaz, mawe û heta zimanî xuya bibin (Genette, 2011: 116; Dervişcemaloğlu, 2016: 165). Genette dema ku dubarebûnan dabeş dike, bi du alî; hem dubarebûna rûdanê hem jî ya gotarê hesab dike û li gorî vê yekê çar qisim dubarebûnan destnîşan dike. Çimkî li gorî wî dibe ku rûdanek du caran dubare bibe an dibe ku rûdanek du caran bê vegêran. Lewma wî (2011: 116) dabeşkirin wiha çêkirîye: rûdana ku carekê qewimîbe carekê tê vegêran, rûdana ku çend (n) caran qewimîbe çend⁴ (n) caran tê vegêran, rûdana ku carekê qewimîbe çend (n) caran tê vegêran, rûdana ku çend (n) caran qewimîbe carekê tê vegêran. Îcar em ê niha van her çar cureyên dubarebûnê bi berfirehî rave bikin û di çîrokên gelêrî yên Kurdî de bi çî şiklî pêk hatibin, nîşan bidin.

⁴ Di vir de her du çend weku hev standard in ku Genette di şûna wan de sembola “n”yê bi kar aniye.

1. Rûdana ku carekê qewimîbe carekê tê vegêran (takvegêran/singulative): Ev awa di vegêranê de ya herî berbelav e. Awayekî klasîk e û di çîrokên gelêrî de jî herî zêde frekansa vegêranê bi vî şiklî ye. Bi piranî di sehneyan de ev yek xuya dibe. Bo nimûne di çîroka “Hecî Gur” de ev paragraf mînaka vê frekansê ye: “Rabû çû ji xwe re şahrikek ji derekê peyda kir û li dor serê xwe gerand û tizbîyeke nod û neh hebî jî da destê xwe û berê xwe da deştê.” (Xamo, 2014: 287)

2. Rûdana ku çend (n) caran qewimîbe çend (n) caran tê vegêran (takvegêran/singulative): Di eslê xwe de cudahîyeke vê dubarebûnê ji ya yekem tuneye. Çimkî di her duyan de jî carên rûdanê û carên vegêranê wek hev in. Lewma ev her du awayên pêşî weku awayekî tîn hesabandin. Tenê di vir de çendanîya dubareyan zêdetir dibe. Di çîrokên gelêrî de teknîka sêbarekirinê nişana vê frekansê ye. Ev yek bi piranî di fonksiyonên xapandin, ceribandî-bexşandin, karê zehmet-pêkanîna karê zehmet de xuya dibe. Bo nimûne di çîroka “Kalikê Teyş” de Kalê Teyş bi dorê her sê qîzikan (Soryaz, Sorxwîn, Xunav) ji bavê wan distîne û dibe qonaxa xwe û di tepsîyekê de savar û goştê ji destê însanan li ser, dide ber wan (bnr. Elban, 2017: 40-43) û ev yek sê caran diqewime û sê caran tê vegêran ku tûşî fonksiyonên ceribandî-bexşandinê tê. Dîsa di çîroka “Mîrza Mihemed û Urfût” de sehneya ku Mîrza Mihemed canê Urfût jê distîne bi vê frekansê hatîye vegêran: “...Mîrza Mihemed hêkek havîte erdê û şikand. Bi keştina hêkê va can ji piyê Urfût kişîya û Urfût kete erdê. Mîrza Mihemed hêka duduya jî keştand, can heta stû jê kişîya. Hêka sisîya jî keştand, Urfût mir.” (Öner, 2016: 60) Ev awa di çîrokên zîncîreyî de bi şiklêkî din xuya dibe. Di van çîrokên gelêrî de exlebî neqaratek heye ku karakterê sereke her cara ku rastî karakterekî tê, wê neqaratê telafûz dike. Bo nimûne di çîroka “Dikil Axa” de di navbera Dîk û karakterên din de her carê ev diyalog derbas dibin:

-Xêr e xalê Dîk, ma tu bi ku de diherî?

-Wey mirina bavê xalê Dîk?

-Lê bibêjim çi?

-Bibêje, Dîko Dîko, Dîkil Axa, Dermalîyê Badil Axa, Fermanlîyê Satil Axa, tu diçî ku? (Xamo, 2014: 255-258)

Bi vî rengî ev diyalog di çîrokê de bi çar karakterên din re çar caran tê axaftin û herwiha tê vegêran. Ji bilî vê em di çîroka “Pîrê û Rovî”, “Çûk û Kelem” û “Sewîlê Sofî” de jî vê dubarekirinê dibînin. Li gorî me ev taybetîyeke din a vegêrana çîrokên gelêrî ye ku bala zarokan dikêşe. Çimkî neqaratên bi vî rengî hem tîpîk in ango dikenînin hem jî bi awayekî helbestkî ne ku tê de melodî û muzîkalîte xurt e ku ev jî nahêle xwîner an guhdêr bitengîje.

3. Rûdana ku carekê qewimîbe çend (n) caran tê vegêran (vegêrana dubarekirî/repetitive): Di vê frekansê de mimkûn e ku perspektîf û şêwazên cuda bikevin dewrê û çend awayên gotarê yên heman rûdanê pêk bînin. Dema di vegêranekê de nivîskar (çîrokbêj) bixwaze rûdanekê zêde derxe pêş vê frekansê bi kar tîne û bi vê yekê xwîner (guhder) dikare naverokê baştir têbigihe (Filizok, 2010b). Mesela di çîroka *Kalikê Teyş* de ji bo ku Kalê, Xunavê nas bike metafora “ken”ê giring e da ku diranê Xunavê bixuyên. Lewma kena Xunavê du caran tê dubarekirin: “Xunav gotina wê wekî henek fam dike û **dikene**. Gava ew **dikene** kalo her du diranên wê yên zêr dibîne û wê nas dike.” (Elban, 2017: 45) Herwiha di vê frekansê de şêwazên gotarê ne mecbûr e ji sedî sed weku hev bin, di heman wateyê de dibe ku bi awayekî din bînin vegêran. Weku din anakronîyên dubarekirî jî bi saya vê frekansê pêk tînin ku di çîrokên gelêrî de ev frekans herî zêde bi saya anakronîyan çêbûye. Bo nimûne di çîroka “Mîrza Mihemed û Çilkezi” de Meîna bi teknîka pêşdebirinê tiştê ku dê biqewimin berêtir ji Mîrza Mihemed re dibêje û paşê ew tişt diqewime û careke din tê vegêran: “Mîrza Mihemed, wextê em çûn, wê çemekê derkeve pêşîya me... Lê wexta em derbas bûn tu bibêjî ‘oxeşş çi aveke xweş e’... Wexta Mîrza Mihemed, li çem derbas dibe, dibêje: ‘Oxeşş çemo tu çi çemekî xweş î.’” (Öner, 2016: 21-23) û ev dubare bi vî rengî gelek didome. Herwiha di vê dubarebûnê de em dibînin ku şêwaza gotina Meîna û şêwaza Mîrza Mihemed ji hev cuda ye. Lê ev yek weku me berê jî got, rewşê naguherîne. Çimkî wate yek e. Li gorî Genette (2011: 118) vegêrana çendbare ya vegêranekê ji ber fonksiyona edebîbûnê ye ku zewq û estetîkeke din dide

vegêranê. Herwiha li ser vê mantiqê gihiştîye wê qenaetê ku xwendin û guhdarîkirina zarokan a dubareyî ya vegêranekê, ne tenê ji ber zarokbûna wan e, herwiha ji ber vê estetîka vegêranê ye jî.


4. Rûdana ku çend (n) caran qewimîbe carekê tê vegêran (vegêrana komî/iretative): Ji bo ku em vê frekansê baştir fam bikin, Genette cureyê duyem tîne bîra me ku di wir de rûdan çend caran qewimîba, ew qas car dihat vegêran. Lêbelê li gorî vê frekansê rûdan gelek caran diqewime lê di carekê de hemû tînen vegêran ku di eslê xwe de ev pir nêzî teknîka kurtkirinê ye. Herwiha ji bo vê frekansê bi piranî qalibên weku “saetan û rojan”, “carê”, “her roj/hefte/sal”, “çil roj û çil şev”, “sê roj û sê şev”, “heft roj û heft şev” û “her gav” di çîrokên gelêrî yên Kurdî de hatine bikaranîn. Ji bilî van qaliban carinan bi forma kêşana lêkeran, di hikayeta dema niha de weku “digirtin”, “dihani”, “dixwarin”, “difirotin” û hwd. ev frekans di çîrokên gelêrî de pêk hatîye. Em digel takvegêranê herî zêde vê frekansê di vegêrana çîrokan de dibînin û Genette (2011: 119) jî di çarçoveya deqên nivîskî de gotîye ku ev awayekî klasîk e û em dikarin şopên wê heya destana Homeros bibin. Yek jî divê em bidin zanîn ku di rewşa destpêkê ya piraniya çîrokên gelêrî de vegêranekê bi vê frekansê xuya ye. Bo nimûne di destpêka çîroka “Silêman Pêxember” de wiha dixuyê: “Sixrî Cin maşoqê dîya Silêman Pêxember bû. Topek fêza gundê wî bû. **Her gav forma teyra dihat, dihat semta wê topê, jê vediciniqî rîya xwe dadigerand.**” (Cindî, 2015b: 175) Bi vî rengî di çîroka “Kalikê Teys”, “Mîrza Mihemed û Urfût”, “Kerê di Bîrê da”, “Çûk û Kelem” û gelekên din de vegêran bi vê frekansê dest pê dike.

Weku xala dawî em dikarin bibêjin ku peywendîya dema rûdanê û dema gotarê tenê bi rêzê an bi maweyê an jî bi frekansê nikare bê destnîşankirin. Çimkî di vegêranan de ev her sê qadên dema gotarê bi hev re pêk tên û yek ji yên din nayê cudakirin. Bi taybetî dema em bala xwe didin çîrokên gelêrî, em dibînin cihê ku lê anakronî çêbûne, herwiha tê de vegêrana dubarekirî jî xuya dibe. An jî dema em li sehneyên çîrokên gelêrî dinêrin, herwiha takvegêranî jî xuya ne û dîsa bi heman şiklî dema ku em bala xwe bidin kurtkirinê di çîrokên gelêrî de, em ê vegêrana komî jî pir bi rahatî bibînin. Li gorî vê yekê, em di bareyê tîpolojîya dema gotarê ya çîrokên Kurdî de dikarin bigihêjin vê encamê ku ew bi piranî bi awayekî kronolojîk rêz bûne. Hevsengîya maweya dema rûdanê û dema gotarê bi lipeyhevhatina sehne û kurtkirinê dirust bûye û helbet herî zêde bi frekansên takvegêranî û vegêrana komî hatine vegêran. Herwiha divê em vê yekê binin ziman ku peywendîya anakronîyan bi vegêrana dubarekirî re, peywendîya sehneyê bi takvegêranî re û herwiha peywendîya kurtkirinê bi vegêrana komî re ne tasadufek e, bi temamî sîstem û estetîka çîrokên gelêrî ye ku vî halê xwe parastine heya roja me.

2. Dema Gramatîk a Çîrokên gelêrî

Dema gramatîk a vegêranê, li gorî dema niha ya rûdanê û dema niha ya gotarê tê destnîşankirin. Dema niha ya rûdanê li gorî dema niha ya karakter dîyar dibe û dema niha ya gotarê jî li gorî dema niha ya vegêr dîyar dibe (Jahn, 2015: 95; Chatman, 2009: 75). Di çîrokên gelêrî de dema vegêr herwiha dema çîrokbêj e ku di çîrokên çarçovekirî yên di asta duyem de carinan ev yek diguhere (Chatman, 2009: 74). Çimkî vegêr êdî dibe karakterekî ji nav çîrokbêj.

Li gorî Genette (2011: 237-238) û Jahn (2015: 97) bi giştî sê demên gramatîk tînen destnîşankirin ku wiha ne: dema borî (retrospective), dema niha (concurrent), dema bê (prospective). Ev li gorî pozîsyona dema niha ya vegêr (çîrokbêj) tê destnîşankirin ku wiha şematîze bibe, dê baştir bê famkirin:



Şikil 1. Şemaya Dema Gramatik a Vegêranê

Dema em bala xwe didin çîrokên gelêrî em tenê awayê yekem dibînin ku di eslê xwe de temamê çîrokê berî dema çîrokbêj rû daye. Lewma divê temamê çîrokê bi kêşana lêkerên dema borî bê vegêran. Lê em dibînin lêkerên ku bi dema niha û dema bê tînen kêşan jî hene. Di eslê xwe de ew lêker jî aîdê dema borî ne, li gorî çîrokbêj. Lêbelê weku Jahn gofî, guherînen dema lêkeran di vegêranê de bi guherîna zûrbûnê re peywendîdar e. Yanî dema ku zûrbûn, a vegêr (çîrokbêj) be, bêyî hin awarteyan dema lêkeran dema borî ye. Lê dema zûrbûn a karakteran be, wî wextî muhtemel e ku lêker bi her sê deman jî bînen kêşan. Ev her sê awa di nav dema borî ya li gorî dema niha ya vegêrî de bi cih dibin ku di çîrokên gelêrî de xuya dibin. Herwiha dema ku gotar li gorî dema niha ya karakter pêk tê bi xwe re hin teknîkên dema vegêranê diafirîne (Yivli, 2015: 631) ku me di sernavên rêz û maweyê de qala van teknîkan kiribû.

Di çîrokên gelêrî de dema gramatik bi piranî dema borî ya nêzîk e: “Carek **hebû** ji caran rehmet dê û bavê guhdaran. Mîrza Mihemed **hebû**, kurê padîşahê Misrê **bû**. Kurê padîşahê Misrê rojekî **gote** wezîr û wezaretê xwe...” (Öner, 2016: 13) Lê carinan hin çîrok bi lêkerên dema niha tînen vegêran ku Chatman (2009: 76) ji vî yekê re dibêje “dema niha ya dîrokî” ku di eslê xwe de rûdan di dema borî de diqewime. Herwiha dema niha ya rûdanê û dema niha ya gotarê bi awayekî eşkere di vî rewşê de ji hev cuda ne ku di vir de çîrokbêj dixwaze xwe zêdetir nêzî dema rûdanê bike: “Mêrik **dide** rê **diçe** sûkê. **Danûstandina** xwe **dike**, piştê ku danûstandina wî **dîqede**, **vedigere tê** li ser kanîyekê, bêhna xwe **vedide**, nimêja xwe **dike** û **difikire**. **Dibêje**: ‘ka ez binêrim, min tiştêk ji bîr kirîye an na.’ Li tîkberên standinê **dinêre**, **dibîne** ku guharên keça xwe ya mezin ji bîr kirine, nestandine. Pir xem **dike** û **dîqehire**...” (Elban, 2017: 39) Lê her çiqas çîrok bi giştî bi vî kêşanê bê vegêran jî muheqeq di destpêkê de hatîye nîşandan ku di dem û dewraneke berê de ew rûdan qewimîye. Yek jî belkî di vî pasaja jor de ya muhîmtir ew e ku zûrbûn ne zûrbûna karakter e û ya vegêr e ku ev, dema rûdanê ji bo xwîner an guhdêr zelaltir dike. Weku din carinan lêker li gorî çîrokîya dema niha (fireh) tê kêşan ku em bi piranî vî formê di tevgerên dubarebûyî û kurtkirinan de dibînin: “Nêçîrvan **her roj diçû**, di çem da, masî **digirtin dihanî**. Ewî jina wî û kurê wan ê piçûk va **dixwarin**. Mesîyên ku zêde bimana jî **difirotin** û pê pereyê wan va debara xwe **dikirin**.” (Öner, 2016: 57) Heke di vir de bi dema borî ya nêzîk, temam an dût hatiba vegêran weku “çû, girt, anî, xwar, firot, kir” dê maneya dubareyê xuya neba.

Weku me berê jî anî ziman, di guherîna deman de zûrbûn pir giring e. Dema ku zûrbûn dikeve çavên karakteran dem pir bi rahatî tê guhertin: “Paşê xwe bi nezani danîye û ji pîrê ra **gotîye**: -Daka pîra delal, ez **dîna xwe didimê**, ku tu **dixwazî** kuçikê xwe **vêxî**? Lê usa xûya ye ku agirê kuçikê te **nagire**? De tu were vî kelemî ji lingê min **derxe!** Tu dikarî bi vî kelemî va agirê kuçikê xwe şên bikî.” (Timar, 2017: 36) Di vî çîrokê de vegêr (çîrokbêj) zûrbûn û heqê gotinê dide Çûkê û lewma çîrok ji dema borî ya temam vediguhere dema niha. Her çiqas di vir de li gorî dema niha ya çîrokbêj çîrok di dema borî de be jî, li gorî dema niha ya Çûkê rûdan di heman demê de ye ku em dikarin wiha şematîze bikin:



Şikil 2. Dema Gramatîk a Vegêranê li gorî Pozîsyona Karakter, Rûdan û Çîrokbêj (1)

An jî carinan dîsa zûrbûn derbasî karakter dibe û em dibînin ku bi dema bê çîrok tê vegêran ku dîsa ew li gorî dema niha ya karakter çêdibe: “Kalo dibêje: Navê min Teys e. Te ez ji xewa şîrîn hişyar kirim. Ji ber vê qasê tu mecbûr î keça xwe ya mezin bidî min. Ku tu nedî min, ez ê te jî û keçên te jî **bikujim**. Wekî din tu dizanî **dê sibê** du qîjik **bêne** li ber derê te, keça xwe bi wan re bişîne.” (Elban, 2017: 40) Di vir de Kalê Teys û Mêrik li gorî dema xwe ya niha dipeyivin û qala dema bê dikin û li gorî wê jî lêker di forma dema bê de hatîye kêşan ku em dikarin wiha şematîze bikin:



Şikil 1. Dema Gramatîk a Vegêranê li gorî Pozîsyona Karakter, Rûdan û Çîrokbêj (2)

Dîsa li gorî dema karakter ya niha, dibe ku rûdan berêtir qewimî be û karakter weku paşdavegeranê (analepsis/flashback) rûdanê vedigêre ku di van rewşan de jî lêkera dema borî bi kar tîne:

Mîrza Mihemed **çi zû bîra te çû?** Ne min li Şengalê ji te re **gotibû** ez qîza meîna çil cenî me. Meîna çil cenî dîya min e, sî û neh cenîyên wê niha li cem in, ya çilan jî ez im. **Min rojekê hêrsa dîya xwe hanî, dîya min nifir li min kir û got, ‘Sikûk tu bibî kerekî û li devê behrê bî.’ Ez jî bi nifira dîya xwe va bûme ker û ketime devê behrê. Tu jî hatî, te ez li devê behrê dîtîm û te ez ji xwe ra hanîm.** (Öner, 2016: 19)

Di vir de Sikûk, jî dema xwe ya niha bi paş da vedigêre û rûdana ku berê qewimî be ji Mîrza Mihemed re vedibêje. Em dikarin li gorî peywendîya dema rûdanê, dema niha ya karakter û dema niha ya çîrokbêj; dema gramatîk a vê pasajê wiha şematîze bikin:



Şikil 4. Dema Gramatîk a Vegêranê li gorî Pozîsyona Karakter, Rûdan û Çîrokbêj (3)

3. Cih

Cih li gorî pozîsyona heyîn û kesan wateyê digire yan jî xuya dibe. Çawa ku dem kronolojîyêke rûdanê pêşkêşî me dike, cih jî derfeta tesbîta heyîn û kesan dide me (Kıran & Kıran, 2007: 249) ku her mexlûqek mecbûr e di cihekî de xuya bibe. Lewma jî her heyînek bi sê alîyan weku berayî, kûrahî û dirêjahî di valahîyêke de bi cih dibe (vgz. Ryan, 2009: 430). Lê ji ber ku di deqên edebî de cih ne bi awayekî fîzîkî û dîtbarî, bi awayekî devkî ango zimanî tê pêşkêşkirin, pîvana cihî jî xeyalî û farazî dimîne. Îcar li gorî Ryan (2009: 421-425) dema ku mirov nirxandina cihê vegêranekê kir, bes divê mirov bi çavekî wisa lê nenêre ku ew tenê ji bo bicihkirina karakteran çarçoveyek û ji bo pêkhanîna rûdanan valahîyêke e. Lewma wî di vegêranê de cih di bin çar sernavan de nirxandîye ku ji bo xebata me, yên herî muhîm her du sernavên ewil in ku em ê li vir qala wan bikin û taybetîyên cihê edebî yên çîrokên gelêrî yên Kurdî, li gorî van sernavan destnîşan bikin.

3.1. Cudahîya Navbera Cihê Rûdanê û Cihê Gotarê

Chatman (2009: 89) ev cudakirin çawa di demê de çêkirîye, bi wî rengî dibêje divê em cihê rûdanê û cihê gotarê jî ji hev cuda bikin. Li gorî wî (2009: 94-95) cihê rûdanê (story space), ew cih e ku hemû bûyer û rûdan tê de diqewimin ku mirov jê re dikare bibêje dekor jî. Cihê gotarê (discourse space) jî ew cih e ku vegêrê vegêranê lê rawestayê. Bi rastî cudakirina van her du cihan weku cudakirina her du deman hêsan nîne. Çimkî weku Ryan (2009: 423) jî amaje pê dike, di dema gotarê de demeke berçav xuya ye, lê di cihê gotarê de cihekî wisa berçav xuya nabe. Yanî cihê gotarê li gorî cihê vegêr dîyar dibe ku ew jî di çîrokên gelêrî de gelek caran muelleq e û herî baş di vegêrên kesê yekem de ev yek dîyar bibe. Her çiqas di vegêranên nûjen de jî ev cudahî bê kirin, Chatman (2009: 89) anîye ziman ku cudahîya

van her du cihan herî baş di vegêranên dîtbarî de û bi taybetî di sînemayê de xuya dibe. Ev cudahî herî zêde di çîrokên gelêrî de mînîmalîze dibe. Ji ber ku danerê yekem ê çîrokên gelêrî nayê zanîn, tesbîta vê yekê zehmettir dibe. Bi du şiklan mirov dikare cudahîyekê bixe navbera her du cihan. Yek jê heke dema ku çîrokbêj (vegêr) çîrok neqil kir, digel wê cihê xwe, derdora xwe û pozîsyona xwe jî pê re dîyar kir, mimkûn e ku tesbît bibe. Ya duyem heke di çîrokên gelêrî yê çarçovekirî de vegêrê çîroka çarçovekirî, vegêrê kesê yekem be, ev cudahî dîsa dibe ku bê tesbîtkirin. Weku din ev cudahî mirov dikare bibêje ku di çîrokên gelêrî de ji holê radibe. Lewma ji aliyê cihê çîrokên gelêrî ve ya ku em ê zêde bala xwe bidinê cihê rûdanê ye ku em ê wê jî li gorî dabeşkirina Ryan di bin sernavê “cihên di vegêranê de” destnîşan bikin.

3.2. Cihên di Vegêranê (Çîrokê) de

Cihê ku karakter lê dijîn û tê de tevdiherin weku cihê vegêranê tê binavkirin ku gelek caran weku dekor jî tê binavkirin. Lêbelê Ruth Ronen dibêje ku divê mirov ferqekê dayne navbera dekor û hemû cihên din ên di vegêranê de û vê yekê bi mînakê şanoyê şênber dike. Çimkî li gorî wî çawa di şanoyê de sehneya ku rûdan li ser diqewime û alema muxayyel a karakteran ji hev cuda dibe, wisa jî di deqên sêwirandî de cihên ku qala wan tê kirin û cihê giştî yê ku rûdan lê diqewime divê ji hev cuda bê nîrxandin (vgz. Ryan, 2009: 421). Lewma Ryan (2009: 421-423) cihên di vegêranê de di bin pênc sernavan de nîrxandine:

1. Çarçoveyên cihî (spatial frames): Cihên ku rûdan lê diqewimin weku çarçoveyên cihî hatine binavkirin. Di vegêranekê de dibe ku gelek çarçoveyên cihî hebin ku ev li gorî hin xisûsiyetan tînan dabeşkirin ku ji wan re kategorîkirina cihî jî tê gotin; weku cihên vekirî û girtî, cihên rasteqîn û fantastîk, cihên nêzik û dûr, cihên çarçoveker û çarçovekirî (Kıran & Kıran, 2007: 250-258).

a. Cihên vekirî û girtî: Cihên ku ji aliyê sînorekî ve nehatine bertengkirin. Di rûdanên aksiyonel de cihên vekirî tînan tercîhkirin û di rûdanên derûnî û fikrî û statîk de zêdetir cihên girtî tînan tercîhkirin. Di çîrokên gelêrî de bi piranî cihên vekirî tînan tercîhkirin. Ji bo ku ew vegêranên aksiyonel in. Bo nimûne di çîrokên Kurdî de bi piranî cihên vekirî yê weku “çol û çepel, çol û çolistan”, “deşt”, “rê”, “zozan, çîya, banî û daristan”, “şaristan baristan”, “derve”, “li ser rûyê dinyayê”, “bajar bi bajar”, gund bi gund”, “rast û best” û gelek cihên din ên bi vî rengî tînan nîşandan.

b. Cihên rasteqîn û fantastîk: Di eslê xwe de cihê ku di vegêranan de tînan nîşandan bi piranî sêwirandî ne. Her çiqaş nav û nîşanên wan rasteqîn bin jî ji ber ku di nav alema sêwirandî de ne, vediguherin formeke sêwirandî. Digel ku cihên bi vî rengî di çîrokên gelêrî de hene weku “Misir”, “Şehêrê Şamê”, “Şehêrê Helebê” an jî weku “gom”, “mal”, “aş”, “bax û mêşe” û hwd. gelek cihên fantastîk û xeyalî jî hene weku “çiyayê Qaf”, “baxê cinetê”, “heft tebeqe bin erdê”, “dinyayeke din” û gelek çem, çîya, gol û behrên fantastîk...

c. Cihên nêzik û dûr: Nêzîkbûn û dûrbûna cihan li gorî peywendîya wan a digel karakteran dîyar dibe. Ev weku cihên aşîna û xerîb jî tînan binavkirin. Di çîrokên gelêrî de cihên dûr, bi piranî weku cihên fantastîk in. Lehengên çîrokan bi piranî bi mebesta pakkirina xerabîyekê yan jî temamkirina kêmasîyekê ji cihên xwe yê aşîna dûr dikevin û derdikevin geryanekê. Weku din dema ku leheng ji cihên asayî derbasî cihên fantastîk dibin, dîsa di navbera wan û cihê wan ê aşîna de dûrbûnek pêk tê.

d. Cihên çarçoveker û cihên çarçovekirî: Ev weku cih di nav cihî de tê pênasekirin. Dekor bi piranî dibin cihên çarçoveker. Di çîrokên gelêrî de di navbera cihên vegêranê de ev peywendî xuya dibe. Esil ev peywendîyeke di navbera cihan de ye. Bo nimûne di çîroka *Kalîkê Teyş* de “erdê li ber kanîyekê” cihekî çarçoveker e û di bin wê çarçoveyê de “heft tebeqe binê erdê” vedibe û di bin wê derê de “qonaxeke mezin” û di nav qonaxê de “çil ode” û di “odeyekê” de xwişkên Xunavê xuya dibin ku di navbera van cihan de peywendîyeke çarçoveyî heye. Esil dekor di vê çîrokê de weku “li welatekî” tê nîşandan ku ev welat çarçoveya giştî ye. Lewma “erdê li ber kanîyekê” cihekî çarçovekirî ye jî. Li gorî vî esasî, dekora giştî ne tê de cihên din bi piranî weku cihên çarçovekirî jî tînan nîrxandin. An jî carinan ev yek halekî fantastîktir digire di çîrokên gelêrî de. Bo nimûne di qîseta “Silêman Pêxember” de mirovê masîgir di behrê de masîyekê digire û keçîka wî masîgirî li malê dema ku zikê masîyê diqelêşe, masîyeke

din jê derdikeve û bi vî şiklî heft masî ji zikê hev derdikevin û ji zikê masîya dawî mora Silêman Pêxember derdikeve ku ev heft masî di peywenda cihî de dikevîne nav peywendîyeke çarçoveyî.

2. Dekor (setting): Cihê giştî yê ku rûdan lê diqewime weku dekor tê zanîn. Yanî weku çarçoveya giştî ya cihî dikare bê hesibandin. Di çîrokên gelêrî de dekor zêde ne zelal e. Gelek caran bi cihên pir muelleq tê destnîşankirin. Bo nimûne dekor weku “li welatekî”, “li gundekî” zêde ne dîyar an jî carinan weku “li şêherê Şamê”, “li gundekî Tekmanê”, “li gelîyê Goyan” piçek zelaltir dibe. Lêbelê carinan di çîrokên gelêrî de rasterast dekorek nayê destnîşankirin. Xwîner an guhdêr bi xwendin û guhdarîkirinê digihêje qenaetekê ku ew rûdan li gundek, bajarek, çîyayek an jî li daristanekê pêk hatiye. Lewma mirov dikare bibêje ku di çîrokên gelêrî de dekor cihên pir berfireh, giştî û şêlû ne.

3. Cihê çîrokê (story space): Cihê ku hem bi rêya tevgerên karakteran dîyar bûbe, yanî weku cihê rûdanê hem jî cihê ku bi fikr û xeyala karakteran dîyar bûbe, yanî cihê ku lê bûyerek neqewimibe û tenê navê wî derbas bûbe, weku cihê çîrokê tê pejirandin. Cihên ku di çîrokên gelêrî de dîyar dibin bi piranî bi aksiyonên karakteran re peywendîdar in. Ji ber ku di çîrokên gelêrî de xweserîya karakter nîne, zûbizû cihêkî ku di xeyala karakter de bê sêwirandin xuya nabe. Cihên ku derveyî cihê rûdanê ne bi piranî yan ji bo pêşxistina rûdanê û vegêranê tînen vegêran an jî ji ber şêwaza gotarê tînen binavkirin. Bo nimûne di çîroka “Hecî Gur” de qala kevirê bimbarek tê kirin ku ew kevirê reş ê li Kabeyê (Hecer’ul Eswed) ye. Lê tu rûdanek li wir pêk nehatiye. Çimkî Gur berî ku bigihêje welatê Hecê bi paş de vedigere (bnr. Xamo, 2014: 287-292). Lewma tenê navê wî cihê derbas dibe. An jî di çîroka *Kalikê Teyş* de qala Çîn û Maçînê tê kirin, lê rûdanek ku li wir qewimibe, nayê veguhastin (Elban, 2017: 44). Dîsa di çîroka “Şaîsmail” de qala du rêyan tê kirin ku yek jê di çil şevan de diqede û ya din di heft rojan de diqede. Leheng rêya çil şevan hildibijêre û li dû Gulîzarê diçe. Lê rêya heft rojan tenê navê wê derbas dibe û tu rûdanek lê naqewime (bnr. Cindî, 2014a: 158).

4. Cîhana vegêranê yan çîrokê (narrative or story world): Cîhana vegêranê digel xeyal û tecrubeya cihî ya xwîner û guhdêran temam dibe. Cihên ku di vegêranekê de derbas dibin, di xeyal û zêhna muxatabê vegêranê de zindî û şênber dibin. Carinan navên hin cîhan di vegêranekê de derbas nebin jî li gorî rastîya cografîk û fizîkî di hişê xwîner û guhdêran de zindî dibin. Bo nimûne carinan lehengên çîrokên gelêrî li ser piştê beranekî an teyrekî, di kêlîyekê de xwe digihînin heft tebeqe binê erdê yan jî dinyaya tarî. Di çîrokê de nabêje ka bi çî şiklî û bi kîjan rêyê xwe gihandine wir. Lêbelê ev rewş bi du awayan di hişê xwîner û guhdêran de şênber dibe. Yek jê yan dê bi teknîka tirûskandinê/teleportasyon (teleportation) şênber bibe ku ev teknîkeke nûjen e yan jî dê li gorî cografyaya fizîkî di valahîya hewayê de bi lezeke zêde şênber bibe. Herwiha ji bilî vê rewşê di çîrokên gelêrî de xisûsiyeteke din jî heye ku fantastîkbûna cihên tê de ne. Gelek cihên fantastîk di wan de xuya dibin. Bo nimûne Çîyayê Qaf yek ji van deran e ku şênberbûna wî di hişê xwîner de li gorî cografyaya fizîkî ya cîhana me çêdibe weku çîyayekî gelek dûr, asê, bilind û biheybet û raz. Heke ne bi vî rengî be, bi awayekî din mimkûn nîne ku xwîner an guhdêr texeyula wî cihî bikin an jî rûdanê di hişê xwe de şênber bikin. Mesela Baxê Cînetê, Dinyaya Tarî dîsa çendek in ji van deran.

5. Alema vegêranê (narrative universe): Ev alem digel cîhana ku di vegêranê de tê destnîşankirin, di bin banê wê cîhanê de cîhanên tirsê, hezê, xwestekê, xeyalê û fikrê yên karakteran jî dihewîne. Bo nimûne di pêkenoka “Hêka Hêstiran” de cîhana çîrokê ew e ku Gundîyek heye diçe bazarê û kundirekê dikire û vedigere mala xwe. Lê di vî cîhana şênber de cîhanekê xeyalî ya karakterê bi navê Gundî jî heye ku ew jî kundira wî (hêka hêstiran) ye û dê jê bîst roj şûnde hêstirek derkeve û dê ew jî bibe xwedîyê hêstirekê. Ev alem bi temamî di xeyala Gundî de pêk tê û kengî ku kundir gêr dibe û ji hev şeq dibe û tam di wê kêlîkê de kêvrîşkek di ber re derdikeve û Gundî bi alema xwe ya bawerîyê hê jî wê xeyala xwe didomîne. Di vî pêkenokê de bi şêwazekê mîzahî du cîhanên cuda yên karakter tînen nîşandan ku ev her du cîhan bi giştî alema vegêranê pêk tînin. Dîsa di pêkenoka “Cemşo û Gemşo” de heman rewş xuya dibe. Herwiha di çîroka “Hecî Gur”, “Şêr û Kergoşk”, “Pişik û Şêr” de alemên vegêranê yên pircîhanî xuya dibin. Lê divê em destnîşan bikin ku ev pir berbelav nîne. Çimkî alema karakteran ne ew qas berfireh e yan jî azadiya karakteran ji berê de dîyarkirî ye ku ev tişt rê nadin ku gelek cîhanên cuda pêk bên di nav alema vegêranê ya çîrokên gelêrî de.

4. Cih û Şayesandin

Pierre Fontanier şayesandin li ser heşt kategorîyan dabeş kirîye ku yek jê şayesandina cihî (topography) ye (bnr. Akdeniz, 2010:). Di çîrokên gelêrî de şayesandina cihî digel ku zêde ne dirêj û bi tafsilat e jî em dikarin bibêjin ku bi çend awayan xuya dibe. Şayesandina yekser a ku vegêr vegêranê radiwestîne û cihî dişayesîne, pir kêr xuya dibe. Egera vê ya sereke dînamîkbûna rûdana çîrokên gelêrî ye ku her gav û bi awayekî bilez çarçoveyên cihî diguherin. An jî heke bi awayekî din em bibêjin; zûrbûna rûdanê ne li ser karakter û cihî ye, li ser tevgeran e. Lewma vegêr rûdanê ranawestîne û dûr û dirêj nakeve nav şayesandinan. Ev tîpolojîya şayesandina cihî ya giştî ye di çîrokên gelêrî de. Lê kêr be jî em carinan rastî şayesandinên cihî tên. Bo nimûne di çîroka “Şaîsmail” de vegêr şayesandineke bi vî rengî dike:

Kete rîya **heft roja**, berê xwe daê, çû. Sê-çar roja çû, rokê çû **lê nihêrî çair çîman, gul û sosin in, serê kulîlkekê nepekyaye: kêleka rê kanîk temiz hebû**. Ser kanîe peya bû, hespê xwe av da, hespê xwe şitav kir, ser çevê xwe şuşt, **parî nanê wî hebû**, derxist xar, **qapûtê xwe kişande ser serê xwe** ji xwe ra raza. **Himberî wî kelake mezin hebû, koç serê temiz**. (Cindî, 2014a: 159)

Ev yek ji şayesandinên me tespîtîkirî ya herî dirêj a di çîrokên gelêrî yê Kurdî de ye. Awayekî din ê şayesandinê jî neyekser tê kirin, di nav pêşketina vegêranê de parçe parçe tê kirin û helbet di bîr û hişê xwîner an guhdêran de, ew şayesandinên parçeyî bi hev dikevin û dîmeneke cihî derdixin holê. Bo nimûne xwîner an guhdêr di çîroka *Kalikê Teyş* de, qonaxa Kalikê Teyş dikare bi vê şewazê di hişê xwe de ava bike. Çimkî pêşî tê gotin ku ew qonax heft qat di binê erdê de ye û qonaxeke pir mezin e. Paşê rûdan hinekî din bi pêş dikeve û piştî ku cara ewil Soryaz çav bi qonaxê dikeve matmayî dimîne. Çimkî dibîne ku li ser rûyê dinyayê mirov çî bixwaze di wê qonaxê de heye ku ev jî şayesandineke din a bi çavên Soryazê ye û rûdan dewam dike û qala kuna dîwarî û çevîya tenûrê tê kirin ku ev yek nîşaneyê awayê avakirina qonaxê û hundurê wê ye. Helbet dîmena qonaxê, piştî ku Xunav tê qonaxê şênbertir û zelaltir dibe ku ew Kalo dixwe xewê û miftayên çil odayên di qonaxê de ji nav rîyê wî derdixe û diçe odaya yekem vedike cendekên her du xwişkên xwe dibîne, di odayên din de celeb celeb zêr û zînet, xwarin û vexwarin û di odaya dawî de jî rastî siwarek û hespê wî yê bayî tê. Piştî vê yekê qismê rûdanê ye ku li qonaxê pêk hatiye tamam dibe û rûdan derbasî sehne an dekoreke nû dibe (bnr. Elban, 2017: 40-44). Ev qisim di çar rûpelan de cih digire û dema xwîner an guhdêr piştî ku vê çar rûpelê dixwîne an guhdar dike, derbarê qonaxê de digihêje qenaeteke wiha: (Qonaxeke mezin a heft qat di bin erdê de û piçek tarî ku tê de kunên dîwaran û çevîyên tenûran û çil ode hene. Di gelek odayên wê de tiştê li ser rûyê dinê tu çî bixwazî tê de heye; zêr, zînet, xwarin, vexwarin û hwd. û helbet hin odayên wê weku zindan û gor hatine bikaranîn.) Vegêr karîbû şayesandineke weku ya li jor di serî de kiriba, lêbelê wê çaxê rûdanê de bi vî şiklî rêz nebûya yan jî dê tu raz û sira rûdanê nemaya.

Herwiha awayekî din ê şayesandina cihî di çîrokên gelêrî de ew e ku bi sifetekê an du sifetan bi awayekî kurt carinan bi devê karakteran û carinan jî bi devê vegêr çêdibe. Mesela di çîroka “Bîrê Çûk” de odaya Mîr Mihê bi sifetekê şayesandin: “Beramberî wê zêr kişand dayê da. Gede bir, navê wî kire Mîr Mihê. Bir çû, **otaxek jê ra çêkir bi şûşa**, Mîr mihê kire wê otaxê...” (Cindî, 2015a: 151) Em tenê dizanin ku ode bi şûşan hatiye çêkirin û weku din tu agahî û teswîreke din li ser nîne. Di çîrokên gelêrî de şayesandin bi piranî wiha kurt û bi sifetekê û du sifetan çêdibin ku dîsa ew ji ber aksiyon-navendbûna çîrokan e. Dîsa çîrokên gelêrî bi piranî bi navên karakteran an jî bi rûdanan tên binavkirin. Lê pir kêr çîrok bi navên cihan tên binavkirin. Di nav çîrokên me de “Zîyareta Çavzer” û “Kerê di Bîrê da” bi navên cihan “zîyaret û bîr” hatine binavkirin. Di van çîrokan de jî navên ku li çîrokên gelêrî bûne digel ku hatine şayesandin, dîsa wisa bi hûrgilî û dirêj nebûne.

Şayesandin di xwendin û bi taybetî di guhdarîkirinê de bal û konsantreyeke hasas û zêde dixwaze. Li gor vî esasî nebûn an kêmbûna şayesandinê di çîrokên gelêrî de egereke din e ku weku vegêran bala zarokan pir dikêşe. Çimkî zarokên berî qonaxa dozdeh salî ji bo maweyeke dirêj bi rahatî nikarin konsantre bibin (Doğan, 2007: 170-171). Lewma divê bala wan her gav zindî bê girtin. Helbet aksiyon ji şayesandinê baştir dikare balê zindî bigire ku ev hevsengî di çîrokên gelêrî de hatiye danîn. Li gorî me ev jî dibe sebeb ku zarok di guhdarîkirin û xwendina çîrokên gelêrî de zû bi zû nekerixin. Heta di

serdema nûjen de wênekirina karakter û dekorên di çîrokên gelêrî de ji bo zarokan, dîsa encameke vê egerê ye ku helbet ev ne tenê ji bo çîrokên gelêrî, ji bo piranîya deqên edebî yê zarokên berî dozdeh salî derbas dibe.

Encam

Di çîrokên gelêrî de dema rûdanê bi piranî muelleq e. Demeke bêsînor û nekişkirî ye. Her gav bi qalibên demên neteqez dema rûdanê tê destnîşankirin ku ev yek hin xisûsiyetan dibexşîne çîrokan. Yek ji van xisûsiyetan ew e ku çîrokên gelêrî di her serdemê de dikare bê neqilkin û rê li ber berdehamiya wê tê vekirin. Xisûsiyeteke din jî nîşaneyê wê yekê ye ku çîrokên gelêrî malê giştî yê hevpar ê mîrovahîyê ye. Yanî bi serdem û dewraneke taybet a miletekî ve nehatîye peywendîdarkirin ku ew anonîm in.

Nebûna demeke zelal tesîr li rêzkirina çîrokên gelêrî jî kirîye ku ew bi giştî kronolojîk rêz dibin. Herwiha nebûna dema nivîskaran a di çîrokên gelêrî de dîsa han daye ku ev kronolojî xerab nebe û herwiha wisa kirîye ku anakronî bi piranî bi devê karakteran û bi rêya diyalogan pêk bên. Herwiha vê kronolojîyê bûyer nêzîktirî bûyerên jîyana rasteqîn kirine.

Ji ber ku çîrokên gelêrî ji aliyê qewareya xwe ve deqên kurt in û ji ber ku maweya dema rûdanê pir berfireh tê girtin, di rîtma dema gotarê de herî zêde teknîkên weku kurtkirin û qevaztin tîk bikaranîn. Herwiha aksiyon-navendbûna çîrokên gelêrî egereke din e ku ev teknîk zêde tîk bikaranîn. Digel vê divê bê destnîşankirin ku ji sê paran du parên çîrokên gelêrî, li ser diyalogan ava bûne ku vê yekê jî teknîka sehneyê di wan de xurt kirîye û çîrok nêzî mîmesîsê ango dramayê kirine.

Frekansên vegêranê ya herî berbelav takvegêran e di çîrokên gelêrî de ku ew peywendîyeke xwe bi teknîka sehneyê re heye. Herwiha sêbarekirin û neqaratên di çîrokên gelêrî de dîsa nîşana takvegêrana wan e ku ew di cureyê takvegêrana “(n) caran rûdan (n) caran vegêranê” de bi cih dibe. Digel vê vegêrana komî jî pir zêde hatîye bikaranîn ku peywendîya wê ya bi teknîka kurtkirinê re eşkere ye.

Li gorî me ev dubareyên neqaratên di çîrokên gelêrî yê zincîreyî de taybetîyeke din a vegêrana çîrokên gelêrî ye ku bala zarokan dikêşe. Çimkî neqaratên bi vî rengî hem tîpîk in ango dikenînin hem jî bi awayekî helbestkî ne ku tê de melodî û muzîkalîte xurt e û ev jî nahêle xwîner an guhdêr bitengije.

Bi giştî em di bareyê tîpolojîya dema gotarê ya çîrokên gelêrî yê Kurdî de dikarin bigihêjin vê encamê ku ew bi piranî bi awayekî kronolojîk rêz bûne. Hevsengîya maweya dema rûdanê û dema gotarê bi lipeyhevhatina sehne û kurtkirinê dirust bûye û helbet herî zêde bi frekansên takvegêranê û vegêrana komî hatine vegêran. Herwiha divê em vê yekê bînin ziman ku peywendîya anakronîyan bi vegêrana dubarekirî re, peywendîya sehneyê bi takvegêranê re û herwiha peywendîya kurtkirinê bi vegêrana vegeandî re ne tasadufek e, bi temamî sîstem û estetîka çîrokên gelêrî ye ku vî halê xwe parastine heya roja me.

Di nîrxandîna giştî ya dema gramatîk de xuya kir ku dema gramatîk a çîrokên gelêrî her gav dema borî ye. Lê lêkerên ku li gorî dema niha û bê tîkê kirandin bi giştî axaftin û diyalogên karakterên di nav çîrokên gelêrî de ne û li gorî dema niha ya karakteran tîkê kirandin. Ev jî dîsa di eslê xwe de li gorî dema niha ya vegêrê giştî (çîrokbêj), di dema borî de dimînin û bi taybetî teknîkên weku paşdevegeran û pêşdebirin, vegêrana komî çêdikin.

Cudahîya di navbera cihê rûdanê û cihê gotarê de herî zêde di çîrokên gelêrî de mînimîlizê dibe. Ji ber ku danerê yekem ê çîrokên gelêrî nayê zanîn, tesbîta vê yekê zehmettir dibe. Bi du şiklan mirov dikare cudahîyekê bixe navbera her du cihan. Yek jê heke dema ku çîrokbêj (vegêr) çîrok neqil kir, digel wê cihê xwe, derdora xwe û pozîsyona xwe jî pê re diyar kir, mimkûn e ku tesbît bibe. Ya duyem heke di çîrokên gelêrî yê çarçovekirî de vegêrê çîroka çarçovekirî, vegêrê kesê yekem be, ev cudahî dîsa dibe ku bê tesbîtkirin. Weku din ev cudahî mirov dikare bibêje ku di çîrokên gelêrî de ji holê radibe.

Ji ber ku çîrokên gelêrî vegêranên aksiyonel in, di cihê vegêranê yê çîrokan de cihên vekirî zêdetir tîk tercîhkirin. Herwiha cihên fantastîk vê aksiyonelîyê pêşdetir dibin û ji aliyê balkêşîyê ve vegêranê xurttir dikin ku ji bilî vê, fantastîkbûna cihan aşînatîya mirovî ya cihî jî tîk dibe ku bi vî rengî dergehê macerayê bêtir vedibe.

Dekor di çîrokên gelêrî de cihên pir berfireh, giştî û şêlû ne. Carinan rasterast dekora çîrokan nayê dîyarkirin ku di encama xwendinê de xwîner xwe bi xwe digihêje qenaetekê ka ew bûyer li ku qewimîye.

Şayesandina cihî di çîrokên gelêrî de zêde cih negirtîye. Em vê yekê bi aksiyon-navendbûna çîrokên gelêrî ve girê didin. Herwiha ev encam bo me qenaetke wiha çêdike ku şayesandin di xwendin û bi taybetî di guhdarîkirinê de bal û konsantreyeke hesas û zêde dixwaze. Li gor vî esasî nebûn an kêmbûna şayesandinê di çîrokên gelêrî de egereke din e ku weku vegêran bala zarokan pir dikêşe. Çimkî zarokên berî qonaxa dozdeh salî ji bo maweyeke dirêj bi rahatî nikarin konsantre bibin. Lewma divê bala wan her gav zindî bê girtin. Helbet aksiyon ji şayesandinê baştir dikare balê zindî bigire ku ev hevsgî di çîrokên gelêrî de hatîye danîn.

Çavkanî

- Akdeniz, S. (2010). Betimleyici Anlatım: Tasvir Metinleri. (Erişim: 12.02.2019). <http://www.ege-edebiyat.org/wp/?p=821>
- Bedirxan, C. A. (2009). *Çîrokbêj – Çîrokên Kurdmançî*. İstanbul: Avesta.
- Bozarslan, M. E. (2000). *Dîtinhezâr*. Stenbol: Weşanên Deng.
- Chatman, S. (2009). *Öykü ve Söylem; Filmde ve Kurmacada Anlatı Yapısı*. (Ö. Yaren, Çev.) Ankara: De Ki Basım Yayım.
- Cindî, H. (2014a). *Hikyatêd Cimeata Kurda I*. İstanbul: Rûpel.
- Cindî, H. (2014b). *Hikyatêd Cimeata Kurda II*. İstanbul: Rûpel.
- Cindî, H. (2015a). *Hikyatêd Cimeata Kurda V*. İstanbul: Rûpel.
- Cindî, H. (2015b). *Hikyatêd Cimeata Kurda VI*. İstanbul: Rûpel.
- Çıraklı, M. Z. (2015). *Anlatıbilim: Kuramsal Okumalar*. Ankara: Hece Yayınları.
- Dervişcemaloğlu, B. (2016). *Anlatıbilime Giriş*. (2. Baskı). İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Doğan, Y. (2007). İlköğretim Çağındaki 10-14 Yaş Grubu Öğrencilerinin Gelişim Özellikleri. *Uludağ Üniversitesi Fen Edebiyat Fakültesi Sosyal Bilimler Dergisi*. Yıl: 8, S. 13, 155-187.
- Elban, Y. (2017). *Carek ji Caran; Çîrçîrokên Şevbuhêrkan*. Dîyarbakır: Dara.
- Fîdan, M. (2014). *Çîrokên Gelêrî ji Herêma Botan*. İstanbul: Weşanxaneyê Berbang.
- Genette, G. (2011). *Anlatının Söylemi: Yöntem Hakkında Bir Deneme*. (F. B. Aydar, Çev.) İstanbul: Boğaziçi Üniversitesi Yayınevi.
- Jahn, M. (2015). *Anlatıbilim; Anlatı Teorisi El Kitabı*. (2. Baskı). (B. Dervişcemaloğlu, Çev.) İstanbul: Dergâh Yayınları.
- Kıran, Z.; Kıran, A. E. (2007). *Yazınsal Okuma Süreçleri*. (3. Baskı). Ankara: Seçkin Yayıncılık.
- Kulamshaeva, B. (2008). Kırgız Hikâye ve Destanlarında Anlatı Zamanları: Atadan Kalgan Tuyak Hikâyesi ile Manas ve Er Töştük Destanları Örneğinde (Yayınlanmamış Doktora Tezi). Ankara Üniversitesi Sosyal Bilimler Enstitüsü, Ankara.
- Omerî, B. (2013). *Carekê ji Caran: Çîrokên Gelêrî*. İstanbul: Avesta.
- Öner, N. (2016). *Mîrza Mihemed; Gurzek Çîrok ji Herêma Serhedê*. İstanbul: Avesta.
- Prince, G. (2011). *Zaravên Vegêranê; Ferhenga Zaravan*. (C. Mistefa, Wer.) Hewlêr: Wezareta Rewşenbîrî û Lawan.
- Propp, V. (1928). *Morfologia Skazki*. Leningrad: Academia.

- Ryan, M. L. (2009). Space. P. Hühn et al. (Eds.), *Handbook of Narratology* (pp. 420-433). Berlin/New York: Walter de Gruyter.
- Sadinî, M. X. (2012). *Ji Kelepora Kurdî Pêkenok*. İstanbul: Nûbihar.
- Thompson, S. (1951). *The Folktale*. New York: The Dryden Press.
- Timar, F. (2017). *Çîrokên Lawiran*. İstanbul: Weşanên Ar.
- Xamo, Z. (2014). *Hebû Tunebû...; Antolojîya Çîrokên Zarokan*. İstanbul: Rûpel.
- Xidir, R. R. (2012). *Teknîkî Gêrranewe le Romanekanî Ebdulla Serac da*. Hewlêr: Yekîtîyî Nûseranî Kurd.
- Yivli, O. (2015). Anlatı Grameri. S. Çitçi ve diğerleri (Ed.). XI. Milli Türkoloji Kongresi Bildirileri içinde (629-644). Cilt: 1. İstanbul: İstanbul Büyükşehir Belediyesi.

Extended Abstract

Introduction: The phenomena of time and space are usually considered together in a narrative analysis. As it has been widely expressed among researchers, these two phenomena are actually considered as two concepts that are related to each other and complement each other. In addition, just as we have stated that no narrative can be timeless, we also state that it cannot be spaceless. Therefore, in this section, the way in which the concepts of time and space are handled in folk tales is analyzed and in this direction, a general typology of time and space in folk tales is determined. In this context, in the analysis of both time and space in folk tales, we thought that it would be best to make a distinction such as story time and discourse time or story space and discourse space in order to obtain accurate results, and these two concepts were analyzed in this way. In addition, in the category of time, the grammatical time in the tales, that is, the conjugation tenses of the verbs, was emphasized. In the category of space, as we mentioned, after the separation and explanation of both spaces, how the depiction of space is done in the tales was another title we discussed in this section.

Method: This study is based on the method of narratology from a structural perspective. Fictional texts are shaped on the basic pillars of narrative. It is possible to name these pillars as narrator, character, event, time and space. And no narrative can be without them. Based on this narrative principle, in this study we have evaluated Kurdish folk tales in terms of the fourth pillar of narrative: time and space. In making this evaluation, we have benefited from the works of Gerard Genette and Seymour Chatman. In the context of the phenomena of time and space in folk tales, we first distinguished between story time and discourse time, or story space and discourse space. The purpose of doing this was not to make any mistakes in our conclusions. In addition, under the heading of time, we also dealt with the grammatical time of the tales. At the same time, under the heading of space, we also touched upon how the description of space is made.

While selecting the folk tales to be used in this study, we first read 1300 folk tales from 28 compiled and published folk tale books and selected 230 successful tales in terms of narrative among them. Since there are different variants among the tales we selected, we tried to choose the most successful variant. Among the remaining tales, we determined 18 tales (4 animal tales, 8 ordinary folktales, 6 jokes and anecdotes) for time and space analysis based on Aarne-Thomson's folk tale classification index and carried out our study on them.

Discussion and Conclusion: We can explain the time and space typology of the folk tales we have reached in this article as follows.

Story time in folk tales is mostly ambiguous and undefined. In general, the story time is specified with imprecise time patterns, which provides situations specific to folk tales. One of these situations is that folk tales are narratives that can be transmitted in every period and are important in terms of reinforcing their continuity. Another is that folk tales are the common property of humanity. In other words, they are not associated with a specific era and period and are anonymous.

The existence of an indefinite time has also affected the chain of events, most of which are ordered chronologically. In addition, the absence of a concept such as author's time in the tales has caused this chronology to remain intact and even anachronisms to be formed from the voices of the characters and through dialogues. Of course, the chronological ordering of events in folk tales also brought them closer to real life.

Since folk tales are short narratives in terms of their volume and at the same time the event is dealt with in a very large period of time, summarizing and subtraction techniques were mostly used in order to balance the rhythm between the time of discourse. In addition, the action-centered nature of the tales is the reason for the excessive use of these two techniques. In addition, it should be noted that two-thirds of the tales are based on dialogues and this situation strengthens the use of stage technique in the tales, which brings the tales closer to mimesis, that is, drama.

The narrative frequency in folk tales is mostly based on singular narration, which is directly related to the stage technique. In addition, the trilogies and refrains in folk tales are indicative of another form of singular narration, namely "an event that happens several (n) times is told several (n) times". In addition, the technique of telling the repeater is a frequency technique that is used a lot in our tales and is directly related to the summarizing technique.

In our opinion, the refrains in cumulative tales are another unique aspect of folk tale narrative that attracts children's attention. This is because such refrains are both typical, i.e. laugh-inducing, and strong in terms of melodic and musical aesthetics, preventing the reader or listener from getting bored.

We can make a general observation about the discourse time of Kurdish tales, which is that they are arranged chronologically. The balance between story time and discourse time is created through the use of scene and summarization techniques together, and of course, frequency techniques such as singular narration and repetitive narration are used the most. In addition, the relationship of anachronies with the repeated narration technique, the relationship of the stage technique with the singular narration technique, and the relationship of

summarizing with the repeating narration technique is not a typology that develops by chance in our tales. This is entirely the system and aesthetics of the folk tale tradition, which has been able to preserve itself and survive until today.

In terms of grammatical time, the events in folk tales always take place in the past tense. However, the majority of the verbs conjugated in the present and future tense in folk tales are in the dialogues and conversations of the characters, and these verbs are conjugated according to the present of the characters. Again, these are actions that remain in the past according to the traditional storyteller's present, and anachronisms are often created with such verb conjugations.

We think that the distinction between story space and discourse space can be minimalized most in folk tales. Since the first performer of the tales is unknown, it becomes much more difficult to make this distinction. In tales, this distinction can be made in two ways. One of them is if the traditional tale teller, when he narrates the tale, also specifies the place he is in, his surroundings and his own position, this distinction can be realized. Secondly, if the narrator conveys the narrative in the first person in the tales within the tale, this distinction can be made, albeit to a lesser extent. Apart from these two cases, it may become impossible to identify the place of discourse in folk tales.

Since folk tales are action narratives, open spaces are mostly preferred in folk tale narratives. Of course, when fantastic places are added to this, the action becomes even more action-packed, and fantastic places make the narrative more interesting and open the door to adventure for the reader or listener as they break the perception of real space in people.

The settings mentioned in folk tales are very broad, general and vague. Sometimes the settings in folk tales are not directly mentioned and at the end of the narrative, the reader or the listener comes to a conclusion about that place.

Space descriptions are not very common in folk tales. We attribute this to the action-centered nature of folk tales. Of course, this result shows us that it is necessary to concentrate very well to read and especially to listen to a description. The fact that descriptions require serious concentration may be another reason for children's interest in folk tales. Because children before the age of twelve cannot concentrate for a long time. Therefore, their attention should always be kept alive. Of course, in this context, action is more conducive to concentration than depiction, and this balance is used very well in the tales.